

Welatê Me

ROJNAMEYA HEFTEYÎ

SAL:1/HEJMAR:1

20-26 SERMAWEZ 1994


BUHA: 25.000 TL(KDVD)

MEBÛSÊ SERBIXWE, TORÎNÊ ŞÊX SEÎD MELİK FIRAT LI SER REWŞA TIRKIYEYÊ GELEK TIŞTÊN KU JI TU ROJNAMEYÊ RE NEGOTIBÛ, JI ME RE GOT:

...DENG NEKIN BILA KES NEBIHÎSE!

Sîstemeke were xerîb û paşpê ye, yekî ku dizanin ji sedî sed Kurd e û dibêje ez ne kurd im, ji wî re her heqî nas dikin û wezîfeyên en muhîm ji didinê. Lê ku li wî welatî hiz bike, ji biratiyê hiz bike, bibêje, "ez Kurd im," dibêjin, "tu xayin î, tu gerek e bêyî kuştin."

Rûpel 8-9



FERMAN: BIGIRE, BIKUJE SEBEB: BILA BITIRSIN

Derûdorên Kurdan, ji kuştina Medet Serhat û şofêrê wî mîna cinayetên berê, dewlet mesûl dîtin. Tê zanîn ku Serokwezîra Tirk Tansû Çiller di beyanateke xwe de daxuyandi-bû ku di destê wan de lîsteya zengînên Kurdan ên alîkariyê didine PKK'ê heye. Piştî beyanata wê, li hemberî şexsiyetên

Rûpel 2

DÎROK

Em şazdeh salî ne!

Rûpel 7


SERBIXWE

Helikoptera PKK'ê li Aspendosê

Rûpel 6

ÇAND-SÎNEMA

Yılmaz Güney kam o?



Rûpel 13

ÇAND-ŞANO

Şanoya me li gor sewiya gel e

Rûpel 12

SERBEST

Ma serekê xwi Seyîd Rizay xwi vîrî nêkenî

Rûpel 16

HEFT ROJ

Karxezal, gur û gerîla

Rûpel 10

RASTIYA ME

Ji rewşenbîr û nivîskarên Kurd re

A. ÎNANÇ

Rûpel 7

DEFTER

Hêviya Welat

Amed TÎGRÎS

Rûpel 11

MEJIYEN GENÎ

Dîsa eynî kirin, dîsa eynî hovîtî. Dinya diguhere, lê mejiyên ku li Tirkîyê li ser kar in, her tim wekî berê dimînin. Ên ku hêviya guherîn û bipêşketinê ji wan dikin, xwe dixapînin. Wisa xuya ye ku, ji xeynî metodên talankirin, girtin û kuştinê di van mejiyên genî de tiştek naguhere. Dema mirov kuştina Behçet Cantürk û Medet Serhat dide berhev, digihîje vê encamê.

Rast e li bere (cephe)yê dewletê bi hêsanî guherîn çênabîn, lê li aliyê din li bereyê Kurdan hewcetî bi guherîneke acil heye. Êdî dinya alem dizane ku, Kurd bi kuştinê naqedin, dewlet jî vê yekê baş dizane, dîsa jî dewlet dike ku di dawiya sed-sala 20'an de, Kurdan bi qirkirin û çavtirsîkirinê ji şerê azadiyê dûr bixe û jî nû ve koletiyê bi wan bide pejirandin. Bi rastî heke Kurd jî nexwazin heta hetayê di bin zilm û zordariyê binalin, divê ber bi yekîtiyê xurt ve bimeşin. Dewlet bi her kuştin û girtinekê re, rê li ber hilweşîna vê sistema genî vedike. Tiştê niha dikeve ser milê Kurdan ev e ku yekîtiyê xurt ava bikin û qet netirsin. Jixwe, dewlet bi van kirinan, ber bi întixarê ve diçe.

DI KUŞTINA KARSAZÊN KURD DE FORMUL Û TALÎMATNAMEYA KUŞTINÊ

FERMAN: BIGIRE, BIKUJE SEBEB: BILA BITIRSI

Ebûqat Medet Serhat û şofêrê wî İsmail Karaalioglu roja 15'ê Sermawêzê bi beşdariya 5 hezar kesî ve li Stenbolê li "Zincirlikuyu Mezarlığı"yê (Goristana Zincirlikuyu) hatin definkirin. Gel, ku di nav wan de gelek kesên ji partiyên siyasî, sendîka, rêxistinên demokratîk, hunermend û nivîskar hebûn, merasîma cenazeyê kirin wek mitingê û cinayetên wiha protesto kirin.

"Mesûl dewlet e"

Di merasîmê de gelek kesên naskirî peyivîn û bal kişandin ser kuştinên rewşenbîrên Kurd. Li gorî wan mesûlê van cinayetên dewlet e. Serokê Baroya Stenbolê Turgut Kazan jî di merasîmê de peyivî û ji dewletê ronîkirina bûyeran û girtina failan xwest. Kazan, di dawiyê peyva xwe de ev got: "Ez dixwazim gawe berî gaweê, heqîqeta vê meseleyê derkeve rastê, di gel ku medya li gorî xwe çirokan dinivise. Ez vê ji bo aştiyê, biratiyê û ji bo hiqûqê dixwazim."

Mebûsê berê M. Ali Eren jî, di axaftina xwe de daxuyand ku ji bûyera Vedat Aydın heya bi ya Musa Anter tu hebek nehatiye ronîkirin. Li gorî Eren, bûyerên wiha jî bo ku nayên ronîkirin, mesûliyet li ser dewletê dimîne.

Di merasîma cenazeyan de ku romannivîsê navdar Yaşar Kemal jî tê de bû, jinan tilîlî ki-



Di cenazeyê Medet Serhat de 5 hezar kes tevî sloganan meşyan.

şandin û beşdarên din jî bi slogan wek ên li jêrê qirandin:

"Şehîd namirin", "Wê Kurdistan bibe gora faşîzmê", "Bijî biratiya gelan", "Qatil dewlet"...

Listeya Çiller


Derûdorên Kurdan, ji kuştina Medet Serhat û şofêrê wî mîna cinayetên berê, dewlet mesûl dîtin. Tê zanîn ku Serokwezîra Tirk Tansu Çiller beyanateke xwe de daxuyandibû ku di destê wan de listeya zengînen Kurdan ên alîkariyê didine PKK'ê heye. Piştî beyanata wê li hemberî şexsiyetên Kurd cinayet pêk hatibûn. Nolî kuştina Behçet Cantürk, Savaş Buldan....

Wek tê zanîn Medet Serhat û şofêrê wî, di 11'ê mehê de ji aliyên kesên nenas ve hatin kuştin. Di vê bûyerê de pîreka parêzer (ebûqat) Medet Serhat jî bi birindari filitî.

Medet Serhat kî ye?

Di sala 1935'an de li Îdirê hate dinê. Xwendina xweya destpêkê li bajarê xwe, lîseyê li Trebzonê xwend. Dema li Fakulteya Hiqûqê ya Unîversîteya Stenbolê xwendevan e di 17.12.1959'an de tê girtin. Ev qewmîn bi navê "Bûyera 49'an" derbasî nava rûpelên dîrokê dibe. Lawekî Medet Serhat bi navê Rûmet heye.

Suut KILIÇ



Av. Medet Serhat

Hêzên xwînxwar ji xwîna gelê Kurd têr nabin, wan Medet Serhat

jî qetil kirin. Lê bila bê zanîn ku tu hêz nema dikare gelê Kurd ji têkoşîna ji bo mirovahiya dîr bixe. Ên di vê riyê de tene kuştin şehîden me ne, di xwîna şehîdan de wê gulên kesk û sor û zer hêşin bibin.

Xebatkarên

Rojnameya Welatê Me


KURD-A cih diguherîne

Ji 1'ê Berfan'bara 1994'an ve navnişana nû ya KURD-A'yê:
Sachsenring 29-31, Köln 50677
Tel: 0221- 31 12 16 û 31 12 17

Kani Yılmaz bernedan. ERNK'ê girtina wî bi nav kir:

SKANDALA POLÎTİK

Nûnerê ERNK'ê yê Ewrûpayê Kani Yılmaz, ji aliyê mehke-meya Îngilîz ve nehat berdan. Wek tê zanin Kani Yılmaz, ku niha li Girtîgeha Brixtonz'ê girtiye, di 16'ê meha çûyî de li ser vexwendîna Parlamenterê Partiya Karker a Îngilîz John Austin Walker çûbû Îngiltereyê û ji aliyê polîsan ve bi hinceta ku "ewlekariya hundirîn tehdît dike" hatibû girtin.



Kani Yılmaz

Di roja 17'ê Sermawezê de mehke-meya civiya, lê tu qerar ne-

da û mehke-meya taloqî 28'ê vê mehê kir. Ji bo piştîgiriya Yılmaz, ji gelek welatên Ewrûpayê zêdetirî 500 Kurd bi xwepêşda-

nekê, ev qerar protesto kirin. Polîs, êrişî meşê kir û li wir polîsek û du meşvan birindar bûn. Ji bilî vê bûyerê Kurdên ku li gelek bajarên Ewrûpayê dijîn, siyaseta Îngilîz protesto kirin.

Rêxistina Ewrûpayê ya ERNK'ê, di 15'ê Sermawezê daxuyaniyek li ser awayê girtina Kani Yılmaz da û ev mesele, wek "skandaleke polîtîk" navand.

Ji hêla din ve Berdevkê Wezîriya Karê Derve yê Tirkiyeyê

Ferhat Ataman, roja 16'ê Sermawezê civînek çêkir û ragihand ku Tirkiyeyê di navbera rojên 12-13'ê vê mehê de bi riyên fermî (resmî) îadekirina Kani Yılmaz ji karbidestên Îngilîz xwestiye.

Tê ragihandin ku li ser xwestina hikûmeta Alman, Îngilîzan Kani Yılmaz girtine. Ji aliyê din ve jî rayedarên Alman bi awayekî fermî ji Îngiltereyê îadekirina Yılmaz xwestine.

KURD-A

DEWLET SÛCÊ XWE VEDIŞÊRE

Heyeta ku ji bo dî-tina şewitandina gund û daristanên Dêrsim û Sêwazê çûbûn, ji aliyê hêzên dewletê ve hatin daqerandin. Heyeta ku ji rewşenbîr û nûnerên 16 rêxistinên demokratîk pêk hatibû, di 8'ê Sermawezê de kete rê, li sînorê Dêrsimê hate sekinandin. Hêzên dewletê, nehiştin ku ev heyeta ji 56 kesan pêk hatî tekevin Dêrsimê.

Roja 12'yê Sermawezê vê heyetê li Stenbolê, li Menzela

Bijîşkan (Tabibler Odası) civînek ji bo çapemeniyê li dar xistin û ev helwesta dewletê protesto kirin.

Hunermend Ferhat Tunç jî daxuyand ku ne bi tenê li Dêrsimê, li hemû derên Kurdistanê nêzikî 2 hezar gund hatine şewitandin.

Serokê Komeleya Hiqûqzanên Hemdem (ÇHD) a Şaxa Stenbolê M. Ali Kirdök, diyar kir ku li herêmê şewitandina gund û daristanan bûye politikaya dewletê



Heyeta ku xwestibû biçê Dêrsimê di civîna ji bo çapemeniyê de tîn dtin.

û li gorî raporên objektîf heta niha 1400 gund hatine şewitandin. Kirdök, di dawiyê peyva xwe de ev

got: "Em gazî li hemû kes, sazî û rêxistinên dikin ku dawî li vî karê qirêjî binîn." Navenda Nûçeyan

KURTE NÛÇE...

Kurd çî ne?

Konferansa ji bo Ewlekarî û Hevkarîya Ewrûpayê (KEHE), di 10 Sermawezê de li Starsbourg'ê civiyan û li ser mafên hindikahiyan (etnikan) biryarek nû stand. Di biryara nû de, dewletên endam, wê hindikahiyan xwe li gorî xwe şirove bikin. Tirkiye, heke ku şertê vê peymanê nû giştan îmze bike, wê Kurd jî xwe wek şexsan karibin îfade bikin û rê li ber hinek mafên çandî dibê ku vebe. Yanê Kurd, ne wek civak, lê belê bi serê xwe wê li hin mafên xwe karibin bigerin.

Eskerî dirêj bû

Eskerî ji 15 mehan derket 18 mehan. Çend sal berê ji bo kêmkirina wextê eskeriyê qanûnên nû derketibûn û hikûmeta wê dewrê eskerî daxistibû 15 mehan. Piştî vê biryarê, ji ber şerê ku li Kurdistanê dewam dike, ihtiyaca artêşa Tirk, bi eskeran çêbû. Hikûmeta koalîsyonê, li ser daxwaza generalan, temenê 3 meh dirêj kirin.

Hilbijartin iptal dibe

Heyeta Hilbijartina Bilind li ser qerarê Mekemeya Bilind a Qanûna Bingehîn (anayasa mahkemesi), kirina hilbijartina 4'ê Berfanbarê iptal kir. Mekemeya Bilind, li ser daxwaza 93 mebûsan, benda ku qala esker û memûrên ku piştî hilbijartina 27'ê Adarê cihê xwe guherandine dikir, fireh kir. Li gorî qerara nû, hilbijêrên Kurd ku ji mecbûrî bar kirine û gundên wan hatine şewitandin jî, dikarin tekevin hilbijartinan. Wê hilbijartin wê ji bo dagirtina cihê 16 mebûsên DEP'ê û 6'ên din çêbibûya.

Du Alman hatin girtin

Li gorî agahiyên Ajansa Anadolu (AA) ku ajanseke Tirkiyeyê ya fermî ye, polîsên siyasî yên Tirk, du Alman bi îdiaya endamtiya PKK'ê girtin binçav. Ev herdu kesên Alman, Karen Landweiler û Gunter Andreas li ber deriyê sînor bi îdiaya ku li ser wan kasetên vîdeoyê yên propagandaya PKK'ê hebûnehatine girtin.

Li Stenbolê kongreyên HADEP'ê

Ji serê vê mehê û bi vir ve rêxistinên navçeyên Stenbolê yên Partiya Demokrasi ya Gel HADEP, kongreyên xwe bi giştî qedandin. Serokên navçeyan bi piranî bi listeyekê hatin hilbijartin. Di kongreyan de beşdarîbûna gel bi awayekî pir bal dikişandê ser xwe. Zehfê kongreyan li navendên navçeyan hatin kirin û gelşa tengbûna cih derkete holê. Ji ber vê rewşê daxwaza kirina kongreyan li cihên fireh hate kirin.

DİK

Emniyetê got 'merheba'

Berî derketina rojnameya me, emniyeta Stenbolê ji du muxabîrên me re gotin: "Merheba". Di 15'ê Sermawezê de ji bo definkirina cenazeyê ebûqat Medet Serhat, du muxabîrên me jî, ji navenda nûçeyan (Salih Günbat û Suut Kılıç) çûn nûçeyê. Lê ji nav ewqas rojnamevanan herdu muxabîrên me bala wan polîsên sîvil kişandin û hîn cenaze li nêvîyê rê bû, nasname ji muxabîrên me xwestin. Piştî bihistina Rojnameya Welatê Me, polîsan ew birin qereqola nêzik. Ji bo hînbûna(!) rastiya rojnamevaniya wan bû. Lê ji ber ku niyeta wan tişteki din bû, muxabîrên me, ji bo du rojan xistin binçav. Di binçaviyê de rojnamevanên me, bi muameleya cudaxwazan terorîstan hatin ezimandin. Ev bixêrhatina emniyetê ya ji bo rojnameya me, ji aliyê me ve hate ferqkirin.

JÛJÎ



Kurdofobiya kevneaqilmendekî: 'Partiya Gelê Kurdistan'


Ev nivîs, ji pênûsa **İlnur Çevik, Berpirsiyarê Weşanê yê Rojnameya Turkish Daily News a ku bi Îngilîzî weşanê dike, derketiye. Nivîskarê me yî liberal bi xeletî an jî nezanî îtirafeke girîng kiriye û PKK wek 'Kurdistan People's Party' ango 'Partiya Gelê Kurdistanê' bi nav kiriye.**

Divê Ewrûpa di şerê li hemberî PKK'ê de bibe yek. "Ji berê ve Tirkiyeyê bi tekrari ji dostên xwe yê Ewrûpayî re digot, çeka ku niha namlûyê wê ber bi Tirkiyeyê ve ye, dibe ku paşê bizivire ser wan, zehf pêwîst e ku destê ku wê çekê digire bê sekinandin.

Niha em dibînin ku militanên Partiya Gelê Kurdistanê (PKK), li gelê welatên Ewrûpayê li ser navê rêxistina xwe ya siyasî ERNK'ê pir aktif e.

Dema Almanya û Fransayê PKK qedexekir, bi taybetî li Almanayê piştgirên wê bi hers rabûn, xesar çekirin û rûyê xweyî rastîn nîşan dan.

Em ji dil dibêjin ku divê hemû welatên Ewrûpayî bikevin riya berbendkirina PKK'ê ya ku



İlnur Çevik heta berî demekê şewirmendê Silêman Demirel bû û dersê qetilkirina gelê Kurd dida Demirel. Niha jî, dilê wî heye "ders" bide Ewrûpa.

Almanya û Fransayê serî kişand. Li aliyekî terorîstan ji nav erdê xwe biavêjin û li aliyê din ferqê têxin navbera wan û bi dehhezaran Kurdên aşîxwaz û ku mebesteke wan a êrişbaz nîn e.

Gelek dostên me li Ewrûpayê qanûnên xwe yê liberal wek mazeret nîşan didin. Lê em dibînin dema ewleyiya welêt têkeve xetereyê, dev ji qanûnên liberal tê

berdan. Binêrin çawa Fransa bi ser misilmanan ve diçe.

Niha ji bo welatên Ewrûpayê wext hatiye ku li dijî PKK vê yekê bikin. Pişt re ew mafdar in ku di warê bînpêkirina mafê mirovan zorê li Tirkiyeyê bikin."

Ev nivîs, ji pênûsa İlnur Çevik, Berpirsiyarê Weşanê yê Rojnameya Turkish Daily News a bi Îngilîzî weşanê dike,

derketiye. Nivîskarê me yî liberal bi xeletî an jî nezanî îtirafeke girîng kiriye û PKK wek 'Kurdistan People's Party' ango Partiya Gelê Kurdistanê bi nav kiriye.

Ew protestoyên gel wek terorîzm bi nav dike û dibêje ku wan rûyê xweyî rastîn nîşan daye. Belê hûn jî bi vê gotina xwe rûyê xwe nîşan didin.

Di dawîya nivîsa

xwe de rê nîşanî Ewrûpayîyan dide: "Hûn endamên PKK ji welatê xwe biavêjin, bila dewleta me wan bişîne ber sêdarê, Pişt re mafê we heye ku hûn bibêjin stoyê wan neêşinin, em jî li pişt we ne."


Ma ev kar ewqas erzan e, bi çend îhaleyan çêdibe? Gelo Ewrûpayî ker in ku xwe biavêjin nav agirê we? Gelo ku tu ji bo vê yekê Tirkiyeyê bi ser de jî bifiroşî dîsa têrê dike? Tu dev ji yekîtiya Ewrûpa berde, ka em te bibînin tu dikarî endamên rojnameya xwe bi tenê li dijî PKK'ê bikî yek; wê kî li te guhdarî bike; ma zanîna axaftina bi Îngilîzî bes e ji bo ku tu her fikrê xwe yê xeyalî bi Ewrûpiyan bidî pejirandin.

S. BERBANG

Ji bo qezençkirina xelatê "peyva veşarî" bibînin û ji me re bişînin.

Jêrenot:
Xelat wê li deh kesan bên belavkirin.

Xelata Xaçepirsê



Zagroslar
Rahmi Batur

XAÇEPIRSA BI XELAT

Hilperîn	Cade	Milet	Di dîrokê de dewletek	Sebir	Bajar (Bi Erebî)
Ufq	Bizot	Navekî mêran	-Li Rûsyayê golek Dirî	Pozîtîf	
Rutbeya Serbaz	P				
	O				
Rêxistinek Baskî	E T A	Di notayê de sekin Kesê di wênayê de		Alif	Pêşpirtîkek
Agir	Filozofek Îngilîz				
A R	Gelf				Sembola Kerkitê (Kükürt)
Rojek	N	Geşt		Pêxemberek	
Nexweşînek		Meta		Elok	
			Kar		
			Belê		
Kevirekî bi buha	Mane		E	Kîst	
	Ling				
		Navekî Yewnanîyan	R		
Eşîr		Dotina pez	B E R Î		



AGAHIYÊN ABONETIYÊ

Min Welatê Me divê

- | | | |
|---------------------------------|-----------------------------------------------|-----------------------------------------|
| <input type="checkbox"/> 3 Meh | <input type="checkbox"/> Li Hundir 400.000 TL | <input type="checkbox"/> Li Derve 30 DM |
| <input type="checkbox"/> 6 Meh | <input type="checkbox"/> 800.000 TL | <input type="checkbox"/> 60 DM |
| <input type="checkbox"/> 12 Meh | <input type="checkbox"/> 1.600.000 TL | <input type="checkbox"/> 120 DM |

Bedelê Abonetiyê ez radizînim

Li Tirkiyê – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi Hesap No: 1100264-1

Li Derve – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507-3

NAV Û PAŞNAV :
NAVNÎŞAN :

Navnîşana Welatê Me

Ayhan ışık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.
Tel-Fax: 2491344 – 245 29 91

PEYVA VEŞARÎ



DIK

Aştiya Amerîkayê nameşe

Peymana aştiyê ji Serokê RRF'ê Yaser Arafat û Serokwezîrê Îsraîlê Îzak Rabîn û Wezîrê Karê Derve Şimon Perez re Xelata Aştiyê ya Nobelê anî, lê dawî li şer û pêvçûnan neanî.

Îsraîlê bî vê peymanê yekîtiya Ereban şikand û bi Misir û Urdînê re jî peymanê aştiyê mor kir. Niha DYA û Îsraîlê dixebitin ku Suriyê binin ser maseya aştiyê.

Îsraîlê heke mirov bi gotina Îzak Rabîn bibêje, "Bi destekî destê rayedarên dewletên Ereban digire, bi destê din êrişî ser şerkarên Îslamî dike." Di nîveka meha Kewçêrê de endamên Hamasê bi daxwaza rizgarkirina 200 girtiyên Filistinî û Serokê Hamasê Ahmed Yasîn leşkerê Îsraîlî Nachson Waksman revandin. Hêzên Îsraîlê bêtir ku li jiyana mirovan bifikirin avêtin ser mala ku ew lê dihat veşartin, li wir Waksman, tîmekî taybetî û du endamên Hamasê hatin kuştin.

Çend rojan li berî morkirina aştiya Îsraîlê û Urdînê hêzên Îslamî li Tel Avivê bombeyek teqandin, 23 mirov kuştin. Roja 2'yê Sermawezê li Gazayê bombeyek di erebeya endamê Îslamî, Cihad Hani Abed de teqiya û wî can da. Hat gotin ku hêzên Îsraîlî ev kar kiriye, Îsraîlê jî ev îdîa red nekîr. Ev gotina Wezîrê Îsraîlê Ephraim Sneh, dide zanîn ku ev kar jî Îsraîlê tê: "Ji şerê li hemberî terorîzmê re, tu tixûb, lîmî û qaîde tune ne."

Serokê RRF'ê Yaser Arafat niha ketiye dewsa waliyê Gazayê. Welatên Ewropayê xeynî axaftinê tu alîkarî nedan û însiyatîfa şerê jî dikeve destê hêzên radikal, bi taybetî jî rêxistinên Îslamî.



4'ê Sermawezê (Mijdar), roja îne li bajarê Gazayê bi hezaran alîgirên Hamasê piştî ku ji mizgeftê derketin kuştina rêberekî Îslamî Cihad, Hanî Abed protesto kirin. Roja 2'yê Sermawezê li Gazayê bombeyek di erebeya Hanî Abed de teqiyabû û wî di vê bûyerê de can dabû. Îsraîlê wek berpirsiyarê vê bûyerê hat suçdarkirin.



Roja 3'yê Sermawezê cendekê rêberekî Îslamî Cihad Hanî Abed ê ku roja berî wê li Gazayê bi teqîna bombeyekê hatibû kuştin, hate naştin (definkirin). Di merasîmê de endamên Îslamî Cihad nehiştin Serokê RRF'ê Yaser Arafat beşdarî merasîmê bibe, ew jî mizgeftê avêtin. Beşdaran bi yekdengî bang kir: "Arafat here ji vir, tu ne serokê me yî"

Konferansa

Zimanê Kurdî ya Navneteweyî

Internationale Konferenz für die kurdische Sprache
06-08.01.1995

VEXWENDIN
EINLADUNG

Cihê Konferansê
Veranstaltungsort

Haus der Kulturen der Welet
John-Foster-Dulles-Allee 10
10557 Berlin

REWSA DINYAYÊ

Ji bo Welatê Me

Ji bo Welatê Me
Sê sal berê em çend kes li dora maseyekê hatiibûn cem hev. Bavê şehîdên nemir Musa Anter, Abdurrahman Durre, Mîrhem Yîgit, Feqe Huseyn, ez û hin hevalên din bûn. Ez wisan bawer dikim ku li Cağaloğlu'yê li Talashan'ê di odeyê mezin de bû. Hevalan dikirin ku Welatê derxin. Rûyê gişkan xweş bû, ji bo nivîsara bi Kurdî. Kê çî difikirî digot û dikeniyar. Paşî Welatê derket, bi rastî jî bo me şahî bû, em gişk memnûn bûn. Di Welatê de nêzikî 56 hefteyî min nivîsên xwe kêm nekirin. Ji bo gelê me ev deynê stûyê min bû. Piştî ku ez bûm Serokê Partiya Demokrasiyê (DEP) min nenivîsî. Min wê çaxê jî hevalan re jî gotibû. Hikûmet jixwe li mehneyan digeriya, ji bo tiştê neyê serê partiyê min dev ji nivîsandinê berdabû. Dîsan jî me xwe ji bênamûsiyê xelas nekîr. Ez hatime girtin, hûn jî baş dizanin partî jî girtin. Lê belê îro derketina Welatê Me gaveke baş e. Ji me re elzem e ku weşaneke bi Kurdî ya bi berdewam hebe. Li dunê ew qas Kurd dijîn, bêweşan nabe. Bila bi zimanekî sivik, zelal û hêsan bê çapkirin, da ku gelê me; xort û keçên me jî bikaribin bixwînin. Ez bawer dikim ku Welatê xizmeteke girîng kir. Em dixwazin zimanê Welatê Me gelek fireh be, ji Wirmiyeyê; heta Haymanayê, ji Qersê heya Hewlêrê bê xwendin. Kurd gelek tiştî jê fêm bikin. Lê divê hêdî hêdî jî yekîtiya zimên çêbibe. Ez dixwazim Welatê Me bibe dengê her kesî. Karê weşanê tiştê hêsan e. Li Ewropayê, Li



Yaşar KAYA

Kurdîstana Başûr, li Başûrê Biçûk, li Ursetê (Rûsyayê) bê xwendin. Divê heval li gorî vê yekê tedbîran hildin. Tu dever kêm nemînin. A duduyan, wekî ku heval dest bi rojnameyê nû dikin, em dixwazin ku zimanê hêsan û zelal be. Hinek xwendevanên Welatê gelek zor didan xwe, heq e ku em riyekê bidine pêşiya wan. Kes jî me jî medrese û mektebên bi Kurdî nehate. Hinek jî me bi xîreta xwe xwendin û nivîsandina Bi Kurdî hîn bûne. Heq e rojname jî me re bibe dibistaneke zimên, çand û dîrokê. Bi kurtasî em dikarin bibêjin ku gelek barên giran dikeve ser rojnameyê. Ev xizmeteke gelek girîng û dîrokî ye. Ji sedî zêdetir nivîskar û rewşenbîrên Kurdan li dinê dijîn. Ji bo rojnameyê heq e dest bidin hev û nivîsan, lêkolînan, helbestan binivîsin, jê re bibin çavkanî. Ez bi xwe, çî jî destê min bê ez amade me. Ev rojnameya me gişkan e. Dengê gelê Kurd e, dengê rewşenbîrên Kurd e. wan hevalên ku di vir de dest bi xebatê kirine, barekî giran dane ser milên xwe. Ez jî wan re dibêjim: Hêsan be, bi xêr û xweşî be, pîroz be. Çî dikin bikin, me bêrojnâmeya Kurdî nehêlin. Ev daxwaza me Kurdan hemûyan e. Riya we bi zehmet û zîndan e. Çare tune, emê li ber xwe bidin. Berxwedan jîyan e, her jîyan jî bo Welatê Me.

FALA WE



BERAN (21 Adar - 20 Avrêl)

Heke hûn naxwazin di vê zivistana reş de mala xwe li mîratê bixin, hay ji zimanê xwe hebin û nekevin binçav. Îradeya we ya zeif li cihên wiha wê bibe sebebê malxerabûna we û ya hevalên we.



GA (21 Avrêl - 21 Gulan)

Sebr û giraniya we, der û dora we aciz dike. Bala xwe nedin paşgotiniyên xelkê. Van rojan mizgîniyeke xêrê dibe bê û belkî riya we bi wan zozanên ku we bêriya wan kiriye bikeve.



CÊWÎ (22 Gulan - 21 Pûşper)

Hevalên we ji fikrên we yê cihêreng û hereketên we aciziyar dikin. An dev ji fikrên wiha berdin an jî dev ji hevalên xwe berdin. Heke ev rewşa we dewam bike, dibe ku hûn bi "Tirşikçî"tiyê bîn binavkirin.



KEVJAL (22 Pûşper - 23 Tîrmeh)

Diltênikbûn û romantîkbûna we, li ba dostên we tê ecibandin. Eleqeya wan, bi we re delaliyan çêdike. Hûn carnar ji ser xwe diçin, ev jî qîmeta we dadixîne. Divê hûn edetên civaka xwe ji bidin berçavên xwe.



ŞER (24 Tîrmeh - 23 Gelawêj)

Hûn dikarin bibin eskerê xelkê, lê gava dor tê karekî we, hûn zû jê direvin. Dibe ev heta demekê fêdekê ji we re bîne, lê hertim wiha dewam nake. Hinekî ji xwe re bin.



SIMBIL (24 Gelawêj - 23 Rezber)

Ji hezkirina wezîfê û karê xwe hûn wextê zewacê û malçêkirinê nabînin. Serên xwe hinekî ji kar rakin û li dora xwe bînerin, ger wisa dewam bike hunê di mal de bimînin.



MÊZÎN (24 Rezber - 23 Kewçêr)

Çend rojên dawîn bêhizûriyek û tîrsek bi we re çê dibe. Zêde li sebebên negerin. Hûn ji xwe re tiştan çêdikin. Ev bêhizûrî dengêya we xera dike. Tîrs ne xelasî ye, hinekî jî wêrek bin.



DÛPIŞK (24 Kewçêr - 22 Sermawez)

Xwe ji însanan veneşêrin û ji dinya xwe ya tarî derkevin. Lê gava hûn derkevin nav însanan jî hay ji xwe hebin, ji bilî xwe bi tu kesên din bawer nebin. Çunkî bawerî bi însanan nabe.



KEVAN (23 Sermawez - 21 Berfanbar)

Niyeta we ne xerab e, lê hûn di têkiliyan de dikarin dilê hevalên xwe bihêlin. Hayê we jî ji van hereketên we çênebe. Hevalên we gazina dikin, divê hûn di van meseleyan de serwest bin.



KARIK (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)

Ji bo ku hûn karê xwe bi hesab û kîtab dikin, di nav hevalên we de îtibara we bêtir dibe. Di nêzik de hûnê di karekî de teklifa serokatîyê bistînin, ecêbmayî nemînin.



DEWLIK (21 Rêbendan - 11 Reşemî)

Xewn û xeyal zikê mirovan tîr nakin. Belkî hûn ne di wextê xwe de hatibin dinyayê û rewşa îro we tîr nake, lê divê mirov li gorî şertên ku di nav de ye bijî. Ji bîr nekin însan du caran nayê dinyayê.



MASÎ (20 Reşemî - 20 Adar)

Jiyana we a xisûsî li derdora we nayê fêm kirin. Rehetî li ku hebê, hûn jî xwe li wir digirin. Talûkeyên rehetiyê gelek in û carnar dibe bela serê mirovan. Xwedê alîkarê we be!

Helîkoptera PKK'ê li Aspendosê

Li gorî ARND'ê helikopterên PKK'ê gelek caran li ezmanê herêma Antalyayê difirin û heta hin caran gerîlayên vê partiyê bi paraşûtan xwe berdidin nav daristanan û gešta xwe li wir derbas dikin.

ARND-Antalya/Aspendos

Piştî dîtina helikopterên PKK'ê li Dêrsimê (Li gorî dîtina Tansu Çillerê) helikopterên PKK'ê li Aspendosê Antalya-

yayê jî hatin dîtin. Li gorî muxabîrê Ajansa Ragihandina Nûçeyên Derew (ARND), berî niha bi 3 mehan helikoptereke PKK'ê, gelek gerîla ji bo gerê birin Aspendosê.

Tê gotin ku PKK, salê du caran gerîlayên ku di şer de qehremaniyan dikin, ji bo gera cihê turîstîk, dişin de verên turizmê.

Muxabîrê ARND'ê dide diyarkirin ku ber-


pirsiyarekî hikûmetê idia kiriye ku haya serokwezîr Tansu Çiller, serleşkerê berê Doğan Güreş û listikvanê televîzyonê Kemal Sunal ji vê gerê heye. Derbarê meseleyê de heta vêga PKK'ê tu daxuyanî nedane.

Diplomatên biyanî yê li Enqereyê (paytexta Tirkiyeyê), li ser bihîstina vê nûçeyê pir ecêbmayî man û bi piranî li ser Kemal Sunal disekinin û hinê jî fam nekirine, bê ka çima haya Kemal Sunal ji vê meseleyê heye.



Weneyê helikoptera PKK'ê. Wenekêşên ARND'ê sond dixwin ku ev helikopter li Aspendos dîtin.

Ma hûn tenê bi me dikarin?



Çima Milî taxima Tirk nikare bikeve olîmpiyatên navneteweyî. An jî çima Galatasaray nikare bibê şampiyonê lîga Ewropa. We dizanibû ku sebebê vê serneketinê Kurd in. Hûnê bibêjin çi eleqeya tîkçûna wê û Kurdan bi hev re heye. Hûnê yekê ji polisên siyasî bipirsin çêtir e.

Lo heyra nizanîm ev çi ye em dikişînin. Ji aliyekî ve zariyên Hecî Evdîla û ji yê din ve jî yê Kemo. Kî ji kê di nîte dibezê me. Em jî, ji xwe re tê de mane. Meseleya rû û simbêl li me qewimiye.

De hûnê bibêjin çi bûye ku

ev c a m ê r sil û bihêrs bûye. Bi xwe ez hêrsa xwe hêç naxwim. Êdî bêhemdî be jî em ketine avê, ha li çokê, ha jî li qirikê. Ezê qewimîne ji we re bibêjim. Jixwe tiştên wiha zehf diqewimîn. Çaxa ku li Swêdê maça Göteborg û Galatasarayê hebû, li bajarê Îzmîrê jî Kurdekî me yî rebenok di qereqolê de girtî ye. Di maçe de du kes bi tevî alan ku jê re dibêjin ala Kurdan derdikevin sehayê. Li vî milî û li wî milî dibezin. Galatasarayî qalekê ji Göteborgê dixwe û maç wiha diqede. Piştî qedîna maçe polis bi ser vî rebenê girtî ve tîn. Golikê Soro te çi xwariye. Çima ku ew herdu kes bi kirina

xwe bûne sebebê xerakirina mîrûzê (moral) futbolvanên Galatasarayê û tîkçûna wan.

Em jî nizanîm gili û gazinên xwe ji kê û li kê bikin. Li gorî giregir û serekên dewletê tu car xeta û şaşî ji wan çênabin. Ma Demirel nabêje he? Li vir bi tenê yê din dimîne. Li min negirin û ji min jî fêm bikin. Ez nikarim navê wan eşkere bikim. Ez sed reca û hêvî ji we dikim, hema hinek be jî çi dibe li me jî bifikirin. Hûn bi wan dikin ew jî tîn bi me dikin, kela xwe di serê me de hêdî dikin. Belkî hûn bibêjin "Ma li Stenbolê jî ev kes bûn sebeb ku Galatasarayî bi qalekê tîk here?" Na, na heyra. Qey em ji we re li defê bixin. Gotinek heye, dibejin: "Debir wêran bû, teyrok bû mane." De êdî ji xwe re seh bikin. Em jî bihurê xwe di we de dibînin û careke din ji we reca dikin. Ma wê kevir bibarin ku pariyek haya we ji me hebe?

Silêmanê KAL

Hurmata me ji we re heye. Di şoreşê de jî cihê we heye. Bêyî we jiyân û şoreş ne mumkûn e. Li vir kê jiyân zû nas kir, kê xwe gihand rastiye? Heger hûn rastiya welatekî ji her aliyê ve nas nekin, jiyana gel neyînî zimên, hûn nivîskarê çî ne? Wê rewşenbîriya we li ser çî be? Çima heta niha rewşenbîrên mezin derneketin? Yên ku derketin jî bêdeng man. Hûn jî baş dizanin ku, welatekî ku bindest be, ne mumkûn e ku rewşenbîrên wî welatî bi nav û deng bin. Ew çiqas mezin be, çiqas xurt be jî, nikare xwe bi dinyayê bide qebûlîkirin. Ji bo vê yekê jî rewşenbîrên Kurd bêdeng man. Niha demeke nû dest pê kiriye. Ji her aliyê ve dengê me der tê. Rastiya welêt derket holê. Mêjî û dilê gel zelal bûn. Gel, xwe ava dike. Çêdike û dimeşe. Ev bêhtir wezîfeya we ye. Taybetiyên rewşenbîran hene. Hûn zimanê gelê

RASTIYA ME

A. ÎNANÇ

Ji rewşenbîr û nivîskarên Kurd re

xwe ne. Hûn dil û cesareta gelê xwe ne. Di şexsiyeta xwe de hûn hemû aliyan temsîl dikin. Heta niha hûn bêimkan bûn, bêsiyaset bûn. Însanê bêsiyaset kor dimeşe. Heya niha em kor dimeşiyayn, ji ber ku em bêyî siyaseteke zelal bûn. Bi tenê dimeşiyayn. Di dawiyê de jî, di destê kesekî de tiştê nedîma. Hûn niha dibînin gel çawa li ser rastiya xwe rabûye. Ew çawa dimeşe. Ev ji we re îlhameke mezin e. Ji we re ruhekî mezin û xurt e. Cesaretek e mezin dide we...

Hûn hêdî hêdî bersiva pêşveçûnan didin, li gelê xwe xwedî derdikevin, her kes vê xwedîderketinê ji we dixwaze, madem hûn rewşenbîr û nivîskarên gel in, hûnê bersivê bidin. Hûn dibînin, em her roj bersivê didin. Eniya xwe xurt bikin. Bêpirsiyar bin. Bi rastî li welat şerekî mezin heye. Ev şer nebe, ne mumkûn e ku Kurdîyê hebe. Ne mumkûn e jiyana neteweyî dom bike. Li Başûr, li Bakur ferq nîn e. Ew xebata ku li Başûr jî dimeşe li ser şoreşa me ye. Di vê demê de dijmin dixwaze hinek tiştan

bike. Hûn vê dibînin. Dijmin di sala çuyî de, "An emê biqedînin, an emê biqedînin" digot. Ne tenê ji bo me, dijmin ji bo hemû Kurdan vî tiştî dibêje. Qedandin ji bo hemû însanên me ye. Qedandina neteweya me ye. Qedandina hemû azadiyan e. Li hemberî vî dijminî har, me wiha li ber xwe nedabûya, di vê salê de, em qediya bûn. Perçe û belav bûbûn. Tiştê nedîma. Ne tenê ji bo PKK, ji bo hemû gelê me. Ne tenê ji bo Bakur, ji bo hemû aliyan Kurdistanê pir tişt diqediyayn. Di vir de, divê mirov durist be û hinek rastiyan di cih de bibîne. Hurmeta me ji we re heye û mezin e. Ên dostên me û heta yên ne dostên me jî, heta yên li dijî siyaseta me jî. Bila bê zanîn ku di vê salê de gelê me bi ser ketiye. Me politîka îmhabûnê ya dijmin vala derxist. Hûn dibînin ji miletekî re rîya jiyane vedibe.

EM ŞAZDEH SALÎ NE

Di şazdeh salan de li Kurdistanê di rewş û kesaniya gelê Kurd de gelek guherînên bingehîn çêbûn. Vê guherînê encama jî nû ve bûyîna gelekî ku bi sedsalan wek kole jiyabû derxiste meydanê.

16 salî xortbûn e. Xortî xurtî ye. Em xurt in. Ev xurtiya me hem ji xortiya me û hem jî, ji tecrûbeyên me tê. Gotineke pêşyan heye dibêje: "Xurtiya xortaniyê û tecrûbeya kaltiyê!"


Gelê Kurd îro tevgera ku di nav de ye heta dawiyê xurt û xort e. Ew xurtî û xortbûna xwe jî di bûyerên hatine serî de, bi tecrûbeyên xwe şirove û bender dike. Jixwe, ji bo gavavêtinê ev herdu hêz girîng in.

Salveger jî, li gorî mebestên xwe yan mezin in, yan jî biçûk in. Hêviya van salvegeran jî di dilê mirov de li gorî mezinbûn û biçûkbûna xwe, geş dibin. Em li salvegera 27'ê mehê dinêrin, bi rastî ji bo ku dilê hemû Kurdên xêrxwaz geş nebe, em tu sedeman nabînin. Mirov dikare vê salvegerê bişîbîne miriyekî xwedî sêwî, ku ji gora xwe rabe û li sêwiyên xwe xwedî derkeve.

Gelê Kurd sêwî bû, belengaz bû, bêkes bû, gêj bû... Lê îro wî ev nexweşiyên xwe hemû ji ser xwe avêtine; di her warî de ketiye nav hebûneke ku dijmin har bike. Kî çî dibêje bila bibêje, ev hebûn bi saya pêşengiya Partiyên Karkeran çêbû. Ev gotina me qet nayê wê wateyê ku berê tu berxwedan çênebûne. Em dixwazin vê yekê bibêjin; Ewropayî hemdemî bûnê bi radeya birêxistinbûna civakê, bikaranîna pênûs û kaxizê ve girê didin. Em dema bala xwe didin rewşa civaka Kurd a piştî vê salvegerê, em dibînin ku wê di warê van taybetiyên hemdemiyê gavên mezin avêtin û hîn jî diavêje. Di têkoşîna rizgariya tu gelan de evqas rêxistin li dar neketine. Tevî hemû kêmasiyên xwe gelê Kurd bi gelek rêxistinên di nav refê eniyê de cih digire. Wek; yekîtiya ciwanan, yekîtiya xwendekaran, yekîtiya jinan, yekîtiya rewşenbîran, yekîtiya dindaran... û hwd. Ji aliyê xwendin û nivîsandinê ve jî pêşketineke baş heye.


Bi kurtasî ev salveger berî her tiştî, ji bo ku gelê Kurd birêxistin û berxwedêr kir mezin e. Bi rêberî û pêşdîtina xwe mezin e.

Î. XORT



LI GOR MEBÛSÊ KURD Ê SERBIXWE MELİK FIRAT

BIXWIN...VEXWIN... BIDIZIN...



Hûn çawa tevî partiyên Tirk bûn û heta niha çi astengî derketin pêşiya we?

◆ Ez di sala 1957'yan de di DP'ê de bûm mebûs. Ew çax ez 22 salî bûm. Du sal û niv şûnde cunta eskerî çêbû û em şandin Yassiadayê (Girava Yassiyê). Em bi îdamê mehkeme kirin. Ne tenê ji bo Kurdan, ji bo Tirkan jî esasen sistema demokrasiyê nîn e. Yanê ev sistema hanê ku navê wê cumhuriyet e, ne sistema cumhuriyetê ye. Tîranî ye, diktatorî ye. Îro li Tirkîyê hinek tiştên ku têne qisekirin bi misade ye. Kemalîst dîktator û tîran in. Ji bo wê jî "kemaîzîm" dîne dewletê ye. Îro li Tirkîyê bi tabîra min "başbozuk cunta" (cuntaya bêserûber) heye. Ew dewletê sewq û îdare dike. Mînak; dewlet bi destê Özel Harp Dairesi (Daîreya Cenga Taybet), Mehkema Anayasayê (Dadgeha Qanûna Bîngehîn) û DGM, MİT, Polês û siyasiyên "Dönme" yên kurd, arnavût, çerkez, laz û ereb tê îdarekirin. Hukim jî di destê wan de ye.



Îro li Tirkîyê hinek tiştên ku têne qisekirin bi

misade ye. Kemalîst dîktator û tîran in. Ji bo wê jî "kemaîzîm" dîne dewletê ye. Îro li Tirkîyê bi tabîra min "başbozuk cunta" (cuntaya bêserûber) heye. Ew dewletê sewq û îdare dike. Mînak; dewlet bi destê Özel Harp Dairesi (Daîreya Cenga Taybet), Mehkema Anayasayê (Dadgeha Qanûna Bîngehîn) û DGM, MİT, Polês û siyasiyên "Dönme" yên kurd, arnavût, çerkez, laz û ereb tê îdarekirin. Hukim jî di destê wan de ye.

PAROLAYA KESÊN KU LI TIRKIYEYÊ ÎKTÎDAR IN EV E:

xerîb e ku cara ewil Serokê hukümetê Silêman got: "Realîta Kurdan He-ye" çûn serê, wî jî xwe jî paş ve avêt. Ji vê şunde xwe ker kir û nefes lê çikiya.

Mesela di 2'yê Adarê de derbeyeke sergirtî çêbû. Mebûsên Kurdan tevqîf kirin. Wan bi îdamê mehkeme dikin. Eger ku efkarê umûmiyê dinyayê (raya giştî ya dinyayê) tune be, wê wek mehkemeyên îstiklalê wan jî bi dar de bikin. Mehkemê wan mina yê engizîsyonê ne. Hiqûq û qanûn tune. Îrada siyasî ya diktatorî çî dixwaze wisa qerarê didin. Îcar di nav vî ehwal û efkarê de mesela hiqûqê Kurdan jixwe nayê axaftin.

Eger tu bêjî ez Kurd im, para te mirin e; eger dixwazî bijî, gerek e tu cahş bî. Îro dewleta Tirk kesîtiya Kurdan nas nake. Gava nas neke jê re ji xeynî sîlah û çiyarê nahêle.


Piştî hûn ji DYP'ê qetiyar we çî kir?

◆ Min di jiyana xwe ya siyasî de roja pêşî çî gotin kiriye dîsa wê gotinê dibêjim. Tişteki cihê min qise nekiriye. Ji bo ku heqên Kurdan bi ulûbeke demokratîk di parlamentoyê de bê qîsekirin, me sî û sê hevalan -Ji wan 23 kes Kurd in- deklaryonek neşir kir, bir û da Reîsê Cumhûr, Serokê Meclîsê, liderên siyasî. Partiyar giş gotin ev tişteki pir baş e, lê mesele di meclîsê de nehat peyvandin. Çûn di şûna me de, qoricî (cerdevan) û ceşan anîn ew dane qîsekirin.

Hûn çima ji DYP'ê qetiyar?

◆ Di parlamentoya Tirk de qîsedayin (axaftin) bi qenaeta min ebes e. Çî qîse bikî xelet fam dikin û feyda qîseyan çênabe. Min di rojnameyan de beyanat didan, min digot, "xwinê nerijînin, xelet e," me deklaryasyon jî ji bona wê sedemê neşir kir. Wan got, "emê te ji partiyê îxrac bikin." Min jî got, "ez jî ji partiya we derdikevim."

Sistemeke were xerîb û paşpê ye, yekî ku dizanin ji sedî sed kurd e û



Mirovê ku Kurd be, qîsên bavê xwe nizanibe, hem bavê wî hem diya wî layiqê şermezariyê ye.

dibêje ez ne kurd im, ji wî re her heqî nas dikin û wezîfên en muhîm jî didin. Lê ku li wî welatî hiz bike, jî biratiyê hiz bike, bibêje, "ez Kurd im," dibêjin, "tu xayin î, tu gereke bêyî kuştinê."

Li gorî we pirsgirêkên zimanê kurdî çî ne û ewê çawa bî çareserkerin?

◆ Dewletên ku Kurd tê de dijîn musade nekîrîne ku Kurd bi zimanê xwe neşiriyatê bikin. Ji ber van tedbiran nivîsandin û qîsekirin bi Kurdî nebûye.

Îro zimanê kurdî eger xwe mihafeze dike, sebebê vê yê herî mezin e ku li gundan medrese hebûne. Di wan medresayan de ilmê dînî jî erebî vergerandine zimanê kurdî, dane xwandinê. Îro yên ku di mektebê Evrûpayê de an jî yên Tirkan de xwendine ew bi kurdî nizanin baş bipeyivin. Yên ku melatî kirine di nav Kurdistanê de, ew zimanê erebî, farisî, tirkî wextê ku tercûme û i-

zahê eserekê kirine bi zimanê kurdî jî Kurdan re gotine. Ji ber vî qasî ew bi zimanê kurdî baştir dizanin. Yên ku di dibistan û unîversîteyên Tirkan de xwendine, axaftinên xwe bi Kurdî nakin, bi Tirkî qise dikin. Xirabî giş jî wê derdikeve. Ya duduyan jî îro, ge-

gür Ulkeyê" de bi Tirkî dinivîsim, carina hin helbestên bi kurdî jî tercûmeyî Tirkî dikim. Gelek welatparêz hene ku bi zimanê xwe nizanin. Li ser vê, helbesteke Qadirê Koyî heye: "Heçî Kurdî, qîsê bavkî nezanî

Dayik Hîze, Bavik zanî da bizanî"

HEVPEYVÎN
Jêhat SERHENG / Mehmet TURAN

rek e zimanzanên kurd li hev bicivin û bi tipên latînî alfabeyeke nû ya ku zimanê kurdî baş bide ifade kirin, çêbikin. Ev alfabeya ku Celadet Bedirxan çêkiriye, em dixebitinê tê de gelekî kêmasî hene. Gerek e zimanzanên kurd bicivin, alfabeyeke baş çêbikin.

Mesela ez bi xwe hiz dikim bi Kurdî binivîsim. Lê xwendevanên kurd % 50 nizanin bi kurdî bixwinin. Ji ber vê jî ez di rojnameya "Öz-

re Soranî ye, dûv re Dimilî ye, (ji Dimilî re hinêk dibêjin 'zazakî' ev xelet e) Dûv Dimilî re "Bextiyarî ye, dûv re Filî (Feyli) ye, dûv re Lûr e, Kelhûr e. Ev gişk lehçe ne. Di her lehçeyê de şîve (devokên) cihê ne. Kurd %60-65 bi Kurmancî dipeyivin. Di Kurmancî de jî îro sê devokên kîvş hene, yek Botî (Behdîni) yek Silivî, yek jî Mehmedî ye. Alimên ziman gerek e li ser van devokan bisekinin.

Dewlet behsa radyo û televizyona Kurdî dike, gorî we armanca devletê çî ye?

◆ Niha ew hindik be jî, eger ne derew be, baş e. Dema me deklaryonek da Suleyman Demirel, wî got, ji min re tekîfên mişexes binin. Me jî nameyek nivîsand. Min, Ziya Halis, Atilla Hûn, Şerif Bedirhanoglu û İbrahim Halil Çelik ew emze kir û tê de tekîfa sê madeyan kir. Yek, me got, ew miqaweleyên beynelmîlêl ku înzeya dewleta tirk li binî heye, jî bo wan bila meclîs qerarekê bide. Ya duduyan me got, madeya 84'an a Qanûna Bingehîn biguherînin. Ya sisêyan jî, me got, efûyeke umûmî derxin. Wî got emê li ser bisekinin. Wer dibêjin, dî re jî ji bîr ve dikin, me mixatab nagirin.

Rewşenbîrên kurd zehf behsa zilm û zora li ser ziman, çand, wêje û tarîxa kurdî dikin, lê serê xwe jî pê re naêşînin, bi kurdî napeyivin, naxwînin û naxwînin. Gelo sebebê vê tewra rewşenbîran çî ye?

◆ Ez jî îro pir li ser vê disekînim û gelek xemgîn im. Kurd di vê meseleyê de pir tembelen. Nanivîsin, gelek mirovên mezin zanînen xwe bi xwe re dibine gorê. Ez mêze dikim, nivîskarên me yên niha bi zimanê xwe nanivîsin. Yên ku zimanê me, tarîxa me xwedî kirine dengbêj û stranbêjen me ne. Nesil bi nesil neqil kirîhe. Ev jî ji bo me eybeke gelek mezin e, ar e. Li miqabilê gelê dinyaye ez bi xwe ku vê difikirim şerm û sar dibim.

Li ser derketina rojnameyeke xwerû bi Kurdî hûn çî difikirin û jî bo xwendevanên me hûn dixwazin çî bibêjin?

◆ Derketina rojnameyeke kurdî di dilê min de emelek û xwestinek dîr û dirêj bû. Ev tişteki zehf hêja ye. Ez we pîroz dikim. Ji xwendevanan re jî hûn silav û mihîbeta min pêşkêş bikin. Ezê gelek kêfxweş bibim. Em jî refê we yê kevin ên salxûrde û tecrûbedide ne, em êdî kal bûne. Ji vê dinyaye ku em diçin, xortên zinde û bi heyatiyê bibînin, ev jî ji bo me hevîyeke mezin e.

Ji xwendevanan re vê helbesta Cegerxwîn pêşkêş dikim:

**Ka ew deşt û ka çiya,
ka ew av û ka giya
Ka ew kon û ka koçer,
ka ew zozan li ku ye?**

**Ka ew dengê pezê qer,
ka ew gulên sor û zer
Ka binefş û ka rihan,
ka gulistan li ku ye?**

**Ka kûvî û ka evor,
ka ew deng û qoreqor
Ka şêrina kewê nêr,
ka nêçîrvan li ku ye?**

**Ka ew cot û ew cotar,
ka ew pez û ka dewar
Kanî berx û kanî kar,
ka bêrivan li ku ye?**

**Ka ew mêrg û kanî deşt,
ka ew bax û ka bihuşt
Kanî seyran, kanî geşt,
ka ew dîlan li ku ye?**

**Ka ew xort û ka kurik,
ka ew şal û ka kerik
Ka govend û ka keçik,
ka zirnevan li ku ye?**

**Ka dilşad û gulîzer,
ka şêrin û kanî zîn
Kanî Eysê, ka Fatê,
ka Perîşan li ku ye?**

**Ka ew mêr û ka ew jin,
ka ew kalê ruh mezin
Ka lîlê û ka lolo,
ka ew heyran li ku ye?**

**Ka ew ken û ka geşî,
ka şadî û ka xweşî
Ka sersal û ka nûroj,
ka mihrîcan li ku ye?**

.....
**Ka welatê meyi rengîn,
îro jar û birîndar
Cegerxwîno de bigrî,
kanî derman li ku ye?**

KARXEZAL, GUR Û GERÎLA

Jiyan dijwar e. Qelşên çiyayê asê bageran disote. Bi qidûmên çokan berf diqelêşin. Wîtinîya bahozê ye, mejiyê wan xem û xeyal û dengên hawarê dagirtî ne. Neyar kap li stû qetiyaye. Bahozaxrosê ew hildane, rû û simbêl qerisîne. Qulikên çavên wan rê nişan didin. Lingên wan ariyane, lê hêrsa dilên wan dikele.

Ji saleke şerê azadiyê, berfanbar e. Çiyayê asê, Çiyayê Zaxros seranser spî û bager e. Çivîk nafirin, xezal qil nakin, hirc ketine xewa zivistanê, qêrînên qulingan nayên. Gul û sosin di bin berfê de, li benda biharê, xulexulên ava zinaran û tava xemfiroş in. Zarok di hembezên dayikên xwe de li ber germa sobeyên har in. Kalên dilxemgîn qelûnên wan li dev in û li ber kozên daran e. Kalekala berxan e di kozan de. Çelek vedikayin, mirîşk li taran e. Dayika pîr xewnekê dibîne.

Jiyan dijwar e. Qelşên çiyayê asê bageran disote. Bi qidû-

mên çokan berf diqelêşin. Wîtinîya bahozê ye, mejiyê wan xem û xeyal û dengên hawarê dagirtî ne. Neyar kap li stû qetiyaye.

Ji kûraniya Xaxurkê sewta Bêritanê tê digihe çiyayên Dêrsimê, dengê Elişêr. Li xaka Agirî Mixtepe "Lêxin", digot Eliyê Dirêj, "Warê bav û kalan, warê Genaral İhsan Nûrî ye." Nalîna birînên Mehsum tî jî qelşên Gabarê. Li ser bircên Amedê kesk û sor hil dibe -agirê canê Zekiya, tilî du çetel. Feryadên wê digihe giyana Kemal, Xeyrî. Feryad digihîjin Merqeda Xani. Ji wir hildibin bal rûyê spî, bal xemla Agirî. Xemla bilind û stara ketiyan.

Geliyê Zilan rabû ser piya. Ken bi berlêvên Xeca Siyabend ket, baskên qulingê kemilîn, Evdêl bang li Temo kir. Minzûr sekinî. Di pala Dêrsimê de peya bû kal Seyîd Riza. Qazî Mihemed şad bû. Zembilfiroş zembil difirotin li Sûka Mehabad.

Firîn kete hemû teyr û tûyan. Qulingan ewrên tarî ref bi ref spî

girê dan. Çar alî pez berdabûn; dayîkan dergûş avêtin, gulan heftreng vekirin; çem herikin. Kalan qelûn kûr kişandin; pîredayikan reş avêtin; keç û bûkan xeml girê dan. Tilîliyê seranser girt, geşt û seyran xemilîn. Govenda Mem û Zîn'ê geriya, sergovend Heval Mezlûm bû.

Roja mirin û mayinê ye. Neyar bi keftariya hezar salan dike di heftsaliyê de wan bixeniqîne. Zaxros sar e. Kevir qerisîne. Di hebanên wan de kirtikek şeker, qetek nan û toraq e. Dil kevir, bawerî bi heta heta ye. Heyfa hezar salan di dilê wan de. Zang û zinar, deşt û banî dimeşin. Li peyî wan bêhesap şop tî. Şopa zilm û zor, kedxwarî û talankeriyê.

Şev ket ser wan, tariyê xwe spî girê da. Zûrînên tebayên şevê tevî ya neyaran dibe. Keleş li navmilên wan bêtebat in. Hêviyê dilê wan girê daye, mejiyên wan pola. Serma li berwan biçûk, neyar li berpûç dibe.

Bahozaxrosê ew hildane, rû û simbêl qerisîne. Qulikên

çavên wan rê nişan didin. Lingên wan ariyane, lê hêrsa dilên wan dikele.

Karxezalek ji wan qil da. Rê lê şaş û faş bû. Dilê wan şewitî. Dan ser, ew bezî, dan ser ew bezî. Rê li wan vebû, ketin şkefteke tarî. Xwe dan ber devê şikeftê, heft kes li du alî rêz bûn. Navmilên wan germ bûn, cemedên piyên wan veheliyan. Je ber ve xew ket çavên wan. Bagerê devê şkeftê sôt, wîtinê ew xistin xewê.

Berbang e. Şiyar bûn. Dengê bahozê sekiniye. Çavên xwe kurtan nav şkeftê, karxezal tune bû. Lê li kûraniyê komek çav diçûrûsîn. Xwe berhev kirin, fişeng dan devê keleşan. Wan çavan kûraniya şkeftê qelaştin, ber bi wan hatin. Ew sekinîn, yek bi yek di nav wan re derbas bûn. Serwêr dabû pêşiyê. Qefla guran bi edeb serî di ber de, şermezar şermezar kişyan, tevî qelşên Zaxrosê bûn.

Li hevdu nihêrin û kenîyan. Ew gur û karxezal.

Mehmet Duran



**NATO
û
PKK**

Parlamentera Îngilîz Alice Mahon, di civîna Encûmana Têkiliyên Sivîl a NATO'yê de lihevrûniştina bi PKK'ê re xwest û rewşa IRA û Îngiltereyê bi bîra delegeyan xist.

Delegeyê Amerîkî James Billbary jî daxuyand ku, kirinên Tirkiyeyê yên der heqên mafê mirovan de nayên pejiwandin.

Roja 16'ê Sermawezê di civîna Encûman (komîsyon)ê de gelşa Kurd jî hate rojevê. Vê civînê ku 15'ê mehê li Washingtonê dest pê kiribû, Li gorî nûçeya Kurd-A'yê,

Parlamentera Îngilîz Alice Mahon di civînê de ev daxuyanî kirine: "Demeke dirêj tu kesî nexwest bi IRA'yê re biaxive. Di Parlamentoya Îngilîz de li yên ku bi IRA'ye re diaxivîn bi çavekî baş nedihate nêrîn. Îro rewş ne wisa ye. Ev yek ji bo Partiya Kurdan PKK'ê jî wisa ye. Divê bi PKK'ê re lihevrûniştin û danûstandin çêbin."

Delegeyê Amerîkî jî di eynî civînê de li ser bînpêkirina mafê mirovan li Tirkiyeyê radiweste û wiha dibêje: "Li Başûrê Rojhilatê Tirkiyeyê (mebest Kurdistan e) mafê mirovan tê bînpêkirin. Li welatekî endamê NATO'yê qebûlkirina vê yekê ne tişteki rast e. Em dixwazin heyetek ji NATO'yê here Tirkiyeyê vekolînan (tetkîkan) bike."

KURD-A

Gerîla tabûran dide valakirin

Dewlet ji ber cerdên gerîleyan, qereqol û tabûran vala dike. Leşkerên xwe jî vedikişînin navendê bajar û navçeyan.

Valakirin behtir li herêmên Dêrsim, Serhad, Botan û Xerzanê tê dîtin.

Li herêmê valakirina tabûr û qereqolan wek "xweranegirtina hêzên dewletê" tê nirxandin. Li gorî nûçe û agahiyên ku gihîştine destê me, li wan herêman livbâziyên gerîla tund û gur dibin.

Tê ragihandin ku ji destpêka Sermawezê bi vir ve zêdetirî 15 qereqol û tabûr bi destên hêzên dewletê hatine valakirin û hilweşandin. Ji van tabûr û qereqolan ên ku navê wan hatine tesbît kirine ev in: Li Gewaşa Wanê Tabûra Ixtê, li Bazîda Agiriyê Qereqola Bedizxanê, li Çiyayê Cudî Tabûra Aşêlixan ku dikeve navbera Şirnex û Cizîrê, li Çela Culemergê Tabûra Kinyanîş ku tê de 600 leşker diman, li gundê Dêrsimê 4 qereqol:

Demewo, Qewal, Akören, Ağırbaşak, li Culemergê tabûra Qewal ku tê de 600 leşker, Peyanîsê ku warê hezar leşkerî ya Qetranîsa ku tê de 400 leşker hebûn hatine valakirin.

KURD-A



ALFABEYA KURDÎ



Celadet Bedirxan

Em Kurd tu car bêalfabe nemane. Ji nivîsa mixî (bismarî) heya bi alfabeya Latîni, me gelek ji alfabe bi kar anîne. Di nava wan de yên ku bi tenê Kurdan ew xebitandine ji hene. Wek nimûne: Kurdên Êzîdî îro jî alfabeke xweser bi kar tînin.

Kurd îro, bi awayekî giştî, bi alfabeya Latîni, Kirî-

li û Erebi dinivîsin. Himdarê alfabeya Latîni Celadet Bedirxan e. Wî cara pêşin di kovara "Hawar"ê de ev alfabe xebitandîye. Em jî bêdestlêdan (bêguherîn) alfabeya wî dipejirîn û pê dinivîsin.

Alfabeya mîr Celadet ji 31 herfan û ji pevdakekê (diftong) pêk tê. Jê 23 bédeng in û 8 jî dengdêr in. Ji aliyê din ve alfabeya me alfabeke fonetîk e. Çawa tê nivîsîn wisa jî tê xwendin.

Tîpên girdek: **ABCÇDEÊFGHIÏJKLMNPOQR-
SŞTUÛVWXYZ**

Tîpên hûrdek: **abcçdeêfghiïjklmnopqrsştu-
ûvwxyz**

Tîpên dengdêr: **a e ê i î o u û**

Çend herfên me hene ku ne wek ên alfabeya Tirkî ne. Heke bi awayekî bi ser re bê gotin, her çiqas herfên me ji aliyê şekil ve bişibin hev jî, dengandina wan ne mîna hev in. Ji bo serwextkirinê emê li ser tîpên "ê", "î", "ï", "q", "u", "û", "w", "x" û pevdaka "xw" yê bisekinin.

Ji bo tîpa "ê" yê : Êzing, êvar, êl, êş, êriş
Ji bo tîpa "î" yê : Bilbil, gilgil, girar, gir, kiras
Ji bo tîpa "ï" yê : Îsal, îin, îşev, îsot, îcar
Ji bo tîpa "q" yê : Qerar, qêrîn, qemer, qeşem, qolinc

Ji bo tîpa "u" yê : Gul, gund, gur, gumgumok, Kurd

Ji bo tîpa "û" yê : Şûr, kûr, qanûn, qelûn, bilûr
Ji bo tîpa "w" yê : Welat, kew, werîs, dew, mêw

Ji bo tîpa "x" yê : Xebat, xelat, xox, xanî, xatir
Ji bo pevdaka "xw" yê : Xweş, xwişk, xwedan, serxwebûn, xwestin.


Xebateke ronîker li ser perwerdehiya Kurdî XWENDINA MEDRESÊ

Em bi ser xwe ve tîn, li pêşiya xwe dimêzin. Noli miroveke/î ku çawan dixeriqe, bere bere bi heşê xwe ve tê û li ser kesbûna xwe di-hizire. Niha em jî di wê rewşê de ne. Lewma em bi dûşa xwe ketine, em dixwazin ku heqîqeta xwe derxin rastê. Di serê pêşiyê de li ser vê yekê pirs dihatin kirin. Vê gavê jî bersivên wan serî radikin.

Jiyana pêşiyên me, pergälên wan ên hêvotîne, ramanê, civakiyê û hwd. ji me re dibin mijarên vekolinê, yên lêgerînê. Xebatên birewerî (xatiratî), tehlilî, şiroveyî ... li ser wan tîn kirin.

Xebateke Zeynelabidin Zinar bi navê "Xwendina Medresê" di destê me de ye. Berhemeke birewerî ye. Li ser pergala xwendina medreseyan me, der heqê debara feqe, mele, seyda ... de agahiyan dide. Di vê civakê de cihê endamên medreseyan, rola wan diyar dîke. Ku nivîskar bi xwe jî ji nava wê civatê tê.

Di gel vê rewşa medreseyan, hêzên kemalî (st) jî betal nemane û tîkîlî nava wê bûne. Pêşî derî li wan dadane, piştî salên 38'an ji nû ve hiştine ku dest bi karên xwe bikin! De êdî hûn bihizirin ka li ser çî hiştine. Ha, em derbibin ku, ev berhem agahî dide me ku med-



rese tim jî hundir ve jî di binê kontrola MIT'ê de bûne.

Her çiqas pirtûk ji aliyê naveroke ve ne xurt be û şaşiyên tîprêzî, gramêrî û hwd. hebin jî hêjayî xwendinê ye. Ji kesên ku serê xwe li ser civaka me diêşinin re her pêwîst e. Çimkî divê ku em her aliyê civaka xwe bizanibin û nehêlin tebayeke me jî veşarî, nuxamtî, bindoşekkirî bimîne. Berevajiyê vê yekê çî aniyê û ku hîn jî tîne serê gelan li ber çavan e. Pirtûk ji aliyê weşanxaneya PENCİNAR ve di sala 1993'an de li Stockholmê hatiye çapkirin.

Zana FARQÎNÎ

NAVÊ MEHAN

Jiholêrakirina cihêtiyên kulturî ne rihet e, an jî wekhevkirina wan. A niha em di vê rewşê de ne. Li pêşberî me hin zehmetî hene. Ev jî bi saya sazî û dezgehên me yên neteweyî dikarin ji rastê bîne hilanîn û gelşên me bîne helkirin.

Ji van zehmetiyên me yek jê jî, ya navê meh (heyv) ên bi Kurdî ye. Di warê navê mehan de gelek geremol, tevlihevî û gêjahî hene. Mehek dikare bi çend navan jî bê navandin.

Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, di dawiya 1993'yan de ji bo sala 1994'an danezanek li ser navên meh û rojên bi Kurdî belav kir û li gorî wê jî salnameyek weşand. Em jî, riwayetî vê biryarê dikin û wan bi kar tînin.

Navê mehan ku ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ve hatine tespîtkirin ev in:

NAVÊ MEHAN

1. Rêbendan
2. Reşemî
3. Adar
4. Avrêl
5. Gulan
6. Pûşper
7. Tîrmeh
8. Gelawêj
9. Rezber
10. Kewçer
11. Sermawêz
12. Berfanbar

DEFTER

Hêviya Welat



Amed TIGRIS

Vê havînê ez li gelek welatan geriyam. Ji Fînlândiyayê heta Holandayê, ji Almanyayê heta Başûrê Biçûk. Her cihê ku ez çûmê, piştî naskirina me, bawer bikin ku gelek kesî behsa rojnameya Welat kirin, ku ka çima dernakeve.

Li Qamişlo, Heleb, Efrîn, Serêkaniyê (Rasileynê) û li Şamê eynî pirs ji me hatin kirin. Belê me wekî heyeta YRWK'ê (Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê) li Qamişlo, Serêkaniyê û li Helebê bi ronakbîr û xwendevanên Kurd re civînên cihê cihê çêkirin. Di van civînan de piraniya pirs û gazîndan hema hema eynî bûn.

Gelo çima Welat hat rawestîn û dernakeve? Dema derdiketin jî, bi awayekî serûber nedigihîşt destên me... Em Stokholmê di cihê wê de bihêlin, li Hamburg, Amsterdam, Stavanger û li Helsînkîyê jî ev pirs, gazîna û rexne ji me û li me hatin kirin û hîn jî dikin.

Belê xwendevanên hêja, hem li seranserî Ewrûpayê û hem jî li Rojhelata Navîn her Kurdeke/î ronakbîr, xwendekar û xwendevan li benda derketina Rojnameya Welat e. Li hêviya Welat û derketina wê ne. Li Rojhelata Navîn, li Dibistana Navendî ya Partiyê, kadro û gerîlayên ku li wir perwerde dibûn jî bawer bikin ku dîsa ji min rewşa Rojnameya Welat pirsîn. Yek ji wan jî Suudî hatibû; gazîna û rexne kirin ku çima ji wan re Welat nayê birêkirin...

Bi hemû kêmasî û çewtiyên wê ve, Kurd li Welat digerin, li Welat dipirsîn û li Welat xwedî derdikevin! Welat di nav Kurdên cihanê de roleke mezîna û girîng (muhîm) lîst. Ji

Kanadayê heta Awistralyayê û ji Swêdê heta Suudî belav dibû. Di dema me de rojnameyêke bi Kurdî ya hefteyî tenê bû. Di warê ziman, edebiyat û kultura Kurdî de rolekî mezîna dilîst. Ew di bingehe çêkirin û berbihevhatina lîteratur û zimanê Kurdî de gaveke pêşketî û pozîtîv bû. Di demeke kurt de, di nav du salan de gelek kesî bi riya rojnameya Welat gelek tişt hîn bûn. Bi kurtasî hînî xwendin û nivîsandina Kurdî bûn.

Ji aliyê din ve rojnameyê nivîskar û hunermendên Kurd li dor xwe civandin û ew bi hevdu dan naskirin. Nivîskar, helbestvan û hunermendên nû û hêja derxistin holê. Di warê berhevkirin û belavkirina berhemên gelêrî û folklorîk ên kurdî de xebateke baş kir. Ji ber van sedeman her xwendevanê Kurd, li hêviya derxistina Welat e. Riya wê dipê. Wekî gelekî xwendevanên Welat, ez jî hêvidar im ku Welatê Me daxwaz, pêşniyarî û pêdiviyên xwendevanên Welat bi cih bîne. Heta berpîrsiyar, nivîskar û xebatkarên Welatê Me, bi tecrûbe, huner û enerjîya xwe ve, vê valahiyê tije bikin. Kêmasî û çewtiyan jî ji navê rakin, an jî qet nebe kêmbikin. Bi kalîteyêke baş weşana xwe bi serûber bidomînin û bi serûber belav bikin. Ez ji Welatê Me re serkevtin û jiyanêke dirêj dixwazim!

Xelata Nobelê çû Japonyayê

Xelata Nobelê ya Edebiyatê, nivîskarê Japonî Kenzaburo Oe stand. Wek tê zanîn ji salê carekê Akademiya Swêdê, nivîskarekê/lî layiqî vê xelatê dibîne. Li gorî Akademiya, Oe niha edebiyata Japonî temsîl dike û ji bo wî wiha dibêje: "Oe, rewşa mirovên dinyaya nûjen tîne berçavê însanan. Wî, efsane û jîyan, bi awayekî wiha xistiye nava hev û nişan daye ku hafizaya mirov dihejîne. Dinya ku ew dixwaze rê mirov bide, bi şîrê hatiye honandin". Kenzaburo Oe, di sala 1935'an de li girava (ada) Shîkoku hate dinyayê. Li gorî gotina wî, heta



Kenzaburo Oe

18 saliya xwe trê neditibû. Mamosteyê wî Profesor Kazuo Watanabe, der barê humanîzma Ronesansê de pir tişt nîşanî wî dane. Oe, ji bo ku mirovekî aşîxwaz û çepgir bû, li welatê xwe her gav dibû hedefa kesên rastgir an milîtarîstan. Di sala 1960'î de romana "Hivdeh", ji bo lawê Sekreterê Giştî yê Partiya Sosyalîst ku ji aliyê faşîstekî hivdeh salî ve hatibû kuştin, nivîsand. Di sala 1963'an de ji bo lawê xwe Hikari ku bi awayekî seqet çêdibe, romana "Meseleyek eTaybet" dinivîse. Kîtabên Oe, li welatên Ewropayê pir nehatine weşandin, lê piştî ku nûçeya xelatstandina pirtûkê belav bû, di nav saetekê de hejmara ku ji vê kitêbê hatin firotin, ji hejmara ku heta vê çaxê hatibû firotin zêdetir bû. Li Tirkiyeyê heta vêga tu kitêbên Oe, nehatine weşandin.



LÎSTIKVANÊN KOMA ŞANOYA DENGÊ GEL:

'ŞANOYA ME LI GORÎ SEWIYA GEL E'

Şanoya Dengê Gel, ji salekê û bi vir ve li şubeya Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) ya Amedê xebatên xwe didomîne. Di nava komê de 9 kes dilizin. Xebata wan a yekemîn, Birina Dilê Min e. Çiroka vê listikê di kovara Rewşen'ê de derketibû û ji aliyê Şervan ve hatibû nivîsandin. Ev listik (tekstê listikê) bi beşdariya 7 kesan ve, bi awayekî kolektîvî hatiye amadekirin.

Şanoya Dengê Gel ku bi Navenda Çanda Mezopotamyayê şubeya Amedê ve girêdayî ye li Stenbolê bi listika "Birina Dilê Min" derket pêş temaşevanan. Koma şanoyê, cara ewil li Amedê listika xwe pêşkêş kiribûn. Kom, di 28.10.1994'an de derket tûrneyê û ji bo pênc rojan li Stenbolê listika xwe pêşkêş kirin. Listik li Îzmîrê sê roj, li Edeneyê jî du rojan li şubeyên NÇM'ê hate pêşkêşkirin. Gel, eleqeyê mezînişanî listikê da; hem ji bo babetê û hem ji bo Kurdiya wê.

Der barê avakirina komê, babeta listikê, kapasîteya listikvanan, şertên xebata şanoyê li Kurdistanê û li ser eleqeya gel, me bi listikvanên komê re sohbet kir.

Avakirina komê û kapasîteya listikvanan

"Ev, listika me ya yekemîn e. Wek ku we jî dît, di listikê de yek şanogerek di çar rolan de dilîze, ji bo vê yekê di listikê de em kêmaniya gelek tiştan dikişînin. Listikvan giş amator in û ne xwediyê tecrûbeyekê ne. Neqşên (motivên) me pir kêman in, hema bibêje tune ne. Saloneke (holek) ku em tê de karibin bilizin jî tune."

Li Kurdistanê şanogeri

"Li Amedê şertên şanogeriye tune ye. Em ji pesta dijmin bêhtir ji warê aborî ve bi kul in. Lê em ne bêimkan in jî. Wexta mirov bixwaze, bi dizî be jî dikare tiştînan bike. Tekoşîna rizgariya neteweyî, ji bo xebatên wiha rê li ber herkesî vedike. Kî kare çî bike, li gorî şertên xwe gerek e bike. Banga me ji hemû huner-

mendên durist re ev e: Deriyê NÇM'ê ya Amedê ji yên bixwaze bixebitin re, heta dawî vekiriye. Kerem bikin werin em bi hev re bixebitin."

Babeta listikê

"Li gorî em dibinin, gel birçiyê xebatên çandî, hunerî û hwd in. Bi taybetî jî ku zimanê van berheiman bi Kurdî be. Di roja îroyin

de li Amedê li her malekê du sê malbat di nava tengasiyê de dijîn. Wexta tu ji wan insanan re bibêji ka werin va ye listika Shakespeare "Makbeth" dilîze, wê bibêjin: "Te got çî, Meqbûle"! Gel dixwaze di her eserî de rewşa xwe bibîne. Ev tûrne bû alîkarê me ku em karibin kêmanişiyên xwe baştir bibinin."


Salih GÜNBAT



YILMAZ GÜNEY KAM O?

Yilmazî xwi ra pey nîzdî 100 hebî filmî û 1520 kitabî verday. Talihê Yilmaz Güney çinêbi çimkî emrê jey zîndanî di viyart. Talihê jey çinêbi çibki şiyarbiyayîşê Kurdan nêdi. Eke weş bimendinî ka ma rê hema gelek filmanê weşan bianco.

Yilmaz Güney 1'ê aşma nîsani 1937 di marda xwi ra bîyo. Eslê jîni Muş ra yo. Jîni verê key xwi erdo Sêwreg û tira pey şiy Edena. Gedeyey jey feqîrey reydi vêrena. O him şiy mekteb û him zî xebatiyawo. Gama ki şono lise çend novelan (öykü) nuseno û erşaweno kovaran rê. 1956 di seba yewnovela xwi keweno hepis. Yew di serrî zere di maneno. 1958 di Yaşar Kemal reydi senaryoyan nuseno. No beyntar di filmanê Atif Yilmaz di kay keno. 1961 di Yilmazî surgunê Qonya kenî. 1963'ê di çaxo ki surguneya jey qediyêna hewna yeno sînema ser o xebatiyêno. Des serran miyan di se filman di kay keno. 40 filman di senaristey, 20 filman di sermiyaney (yönetmen) keno. Hinî hema hema jey şinasneno. Seredê serranê 1970 di semedo ki telebanê şoreşgeran rê ardim keno, hewna tepşiyêno. Na ray zî di serrî hepis di maneno. O zere di zî veng nêvindeno kitabî nuseno. Wexto ki hepis ra vejîyeno filmê Embazî (Arkadaş) anceno. Tira pey dest bi filmê Endîşî keno. Antîşê nê film di, Yumurtalik di yew hakim



belay xwi bide saweno, o zi panano nê hakimî kişeno. Na ray 24 serî ceza danî bide. O hepis di senaryoyan û kitabî nêweyan nuseno. Labelê dewleti jey rehet nêverdena, seba nuştanê cê newerna wazena ceza bi-

derda. Yilmaz fam keno dewleti wazene jey hepis di bihelesna, bikşa. O zi hepis ra remeno şono Fransa.

Nê serran di filmê yê "rayir", festîwalê filmê Cannesê di xelaya zernên gêno. Na xelaya

namedar ra pey heme dîna jey şinasnena.

Nîzdî mergdê xwi, Fransa di bi name bê "Dês"î yewna film anceno. 9'ê aşma payîzî ya verîni di Parîs di dinay xwi bedelheno.

Yilmazî xwi ra pey nîzdî 100 hebî filmî û 1520 kitabî verday. Talihê Yilmaz Güney çinêbi çimkî emrê jey zîndanî di viyart. Talihê jey çinêbi çibki şiyarbiyayîşê Kurdan nêdi. Eke weş bimendinî ka ma rê hema gelek filmanê weşan bianco.

Yilmaz ma virî di yo. Yilmaz ma miyan di yo. Cay jey seredê ma ser o yo. Ma jey reyra çend payedar bî endî tayan o!

Cemal PİRANIJ

KELEPOR

Em di 'Welatê Me' de hev bibîn



DILBIXWÎN

Dîrok eger xwe kor neke wê binivîsîne; Rojnameya Welat; rojnameyê hefteyî bû, xwerû bi Kurdî berhemên dîrokî, wêjeyî, hunerî û hwd. diweşandin. Xizmeteke mezin ji gelê Kurd re kir. Hem dibistan bû, hem jî mamoste bû. Bûbû pird û peywendiyê xurt û tunde di navbera hemû zaravayên Kurdî de. Her kesekî niştîmanperwer dikaribû xwe li ser rûpela Welat bibîne. Yekîtiya zimên, yekîtiya neteweyî ya çandî û hunerî di nava dilê Welat de pêk dihat. Kurdan xwe bi rojnameyê serfiraz û serbilind didîtin.

Belê, eger dîrok ne bêbext be, wê hinekî ji me re behsî ciwanî, bedewî û giranbuhabûna Welat bike.

Welat tovek bû. Tovê ku tu caran namire, tovê bi gel re jiyana dibe û xwe nû dike. Weke her tiştî, weke her guleke ku di şewqa Newrozê de xwe ji nû ve dixemlîne, Welat jî bi keneke din, bi ciwaniyêke din, bi xemlî û xêzeke din, dîsan dibe hevala rêveçûn û serbilindiya me ya ku tu caran xwe ji jiyana azad û serbixwe qut nake.

Welat xwe nû dike û dibe "WELATÊ ME". Bêguman emê di Welatê xwe de xurttir hev bibîn û bi fedekariyêke bêhempa xwedî lê derkevin û ji kêmasiyan biparêzin. Parastina rojnameyê

ji kêmasiyan, ne tenê karê berpirsiyarên rojnameyê ye, her wiha berpirsiyariyêke me jî heye.

Bi derketina Welatê Me hinek digirîn, hinek dikenin. Min bihist, dibihîzim jî, dema ku Welat hate girtin hinekan govend gerandin, hinekan xwe ji bo deranîna

"Rojnameyêke alternatîv" xwe amade kirin û li buroyan geriyên hinekan jî bi bîr û bawerî ji bo nûkirina Welat ked dan û bingehe amade kirin. Gelo, ewên diê xwe bi rawestandîne geş dikirin û serxweş dibûn, niha çi dibêjin?

Riya Welat tu caran nayê girtin, lewre ew riyayê gotina rast e, riyayê gel e, riyayê baweriyayê bi azadiyê ye. Di Welatê de me Welatê xwe didîtin. Di Welatê Me de emê dîsan welatê xwe bibîn, lê hema welatekî nû, Welatekî ji azadiyê re nêzîk, welatekî bi hêviya serxwebûnê avis.

Hevaltiya me ne ji bo rojekê, du rojan e. Em heta dawiyê hevalên hev in. Ev hevaltî bêbend û sînor e. Di Welatê de, di Welatê Me de em niha li ser wê riyê ne, riyayê ber bi rojê ve dibe.

Di Welatê Me de rojaya baş be hevalino!

Nîşandayîna Filmên Yilmaz Güney dest pê kir

Waqfa Yilmaz Güney, di navbera 14-28'ê Sermawezê de Nîşandayîneke Giştî ya Filmên Yilmaz Güney li dar xist. Vê Nîşandayîne roja 14'ê Sermawezê bi galayekê dest pê kir. Di galayê de filmê Yol (Rê) hate nîşandan. Li vir jina Yilmaz Güney, Fatoş Güney axifî û daxuyand ku dewletê rê nedayê da ku

Filmê Duvar (Dîwar) bê nîşandayîna û hîn jî sansur li ser hinek nivîsên wî yê siyasî heye. Filmên ku tên nîşandayîna ev in: Yol (Rê), Sürü (Kerî), Ağıt (Şin), Umut (Hêvî), Baba, Umutsuzlar (Bêhêvî), Arkadaş (Heval), Endişe, Düşman (Dijmin), Duvarın Etrafında (Li Dor Dîwêr) û Yilmaz Güney Belgeseli (Filmê Belgeyî).

ZAROKINO! Çavê we bi rohnî. Ji vê heftiyê bî şûn ve ezê vî rûpelî ji bo we bixemilînim. Êdî hûnê jî bi zimanê xwe bixwînin û

binivîsin. Heftiyêke din xeberên min ên pir xweş ji bo we hene. Li hêviya min bin.

Mamoste ZOZAN

Li dora çemê Feratê gundekî bi bax û bostan hebû. Di nava şinahiyê de, gundekî xweş û şîrîn bû. Li vî gundî kerek, qazek, betek û qulingek bi hev re bibûn destbira û bi di gel hev dijiyan. Serê payîzê destbirayên me gihîştin hev û ji hev re gotin em îsal ji xwe re genim deynin. Bi hev re erdê xwe çandin. Piştî qederekê bet, qaz û qulingê ji kerê re gotin: "bira emê biçin zozanan, gerek e tu li zadê me xwedî derkevî. Kerê got: "bila çavê we li pişt we nemîne, ezê li vir weke çavê xwe li zadê me binêrim." Wan xatir ji kerê xwestin, çûn zozanan. Bihar hat kerê

Çiroka Betê, Qaza, Quling û Kera


Bet û bet betka betey tê



me yê gewr jî li ser zad e û lê xwedî dertê. Dinya êdî şîrîn bûye. Kerê me jî, devê xwe ji şinahiyê dernaxe. Lê xelq napejirîne ku ker bikeve nav zevî û şinahiyên wan. Dema ker dikeve nav zevî û mîrgên wan, li kerê didin. Carek û du caran, kerê gewr lê dinêre, wiha nabe wê xelk bi lêdanê wî bikujin. Dest bi xwarina zadê xwe dike. Her ku diçe ker xurt û qelew dibe, lê zad jî kêr dibe. Bihar çû havin hat. Kerê me, xurtir bû lê zad xelas bû. Wextê hatina betê, qazê û qulingê hat. Kerê me, ji gund derket çû ba mala xalê xwe. Piştî du hefteyan zivirî gund. Wê demê destbirayên wê jî zivirîbûn. Li erd mîzekirin, zad û mad tuneye, şaş man. Gava ker hat gund, jê re gotin: "Bira ka zadê me ev çi hal e? Kerê got: "Ez ji mala xalê xwe hêj tîm. Ez nizanim, hûn zanin. Jê re gotin: "Malmîrat zad teslimî te bû. Tu dizanî tu çi dibêjî?" Kerê sed sond xwarin

got: "Haya min jê tuneye." Rabûn bi hev re çûn cem mele. Mele got: "Herin, ser ava Feratê, bixwin sond û qeseman, wê derewîn derkeve holê." Rabûn çûn ser ava Feratê, ku bixwin sond û qeseman. Ava çemê Feratê boş e, gure gura wê guhan ker dike, pêlên wê dilan diqetîne. Li devê avê sekinîn; betê rabû sond û qesem xwar û Got: Bet û bet betka betey tê Bet û bet kakilê qubey tê Bet û bet haşa madalla Bet û bet xenîm û Allah Xwe li avê da derbasî şeqa din bû. Qazê got:: Qaz û qaz qazka qazey tê Qaz û qaz kakilê qubey tê Qaz û qaz haşa madalla Qaz û qaz xenîm û Allah Xwe li avê da di nav pêlan de derbasî aliyê din bû. Qulingê got: Qul û qul qulka quley tê

Qul û qul kakilê qubey tê Qul û qul haşa madalla Qul û qul xenîm û Allah Xwe li avê da wek masîya derbasî milê din bû. Dora Kerê hat, lê belê nava dilê Kera gewr diqete. Dema pêlan dibîne mejiyê wê dizivire. Gurpa gurpa dilê wê ye. Çû ber çem û got: Zir û zir zirka zirey tê Zir û zir kakilê qubey tê Zir û zir haşa madalla Zir û zir xenîm û Allah Xwe li avê da. Pêlan ew di nav xwe de bir û winda kir. Ewê bi hevalên xwe re xayîniyê bike wê dawiya wan wek Kera xayîn be.



N A M E Y Ê N X W E N D E V A N A N

Bi xêr hat Welatê Me

Rojnameya Welat du sal di şertên pir dijwar de jiyana xwe domand. Ji Kurdistan re bû deng, bû hêvî. Di navbera xwendevan û nivîskarên xwe de bû pirek. Di dîroka rojnamegeriya Kurdî de bêguman e ku rojnameya Welat ciheki teybetî girt. Di dîroka azadiya Kurdistanê de rojnameya Welat rolekî girîng hilda û barekî mezin da ser milên xwe. Hawirdorên wê, hovîtiya dijmin girtibû. Dadgehên wan, dozgerên wan wek kundan dor lê girtibûn. Di bin van şertan de her hejmara Welat bû kelem di çavên dijmin de çikiya. Welat di her hej-

marên xwe de germaya şervanên azadiyê da rûpelên xwe. Bi nûçeyên şerê azadiyê xemilî. Bi şîroveyan xwe dewlemend kir. Herêmên çandî, herêmên hunerî û siyasetê bi hev dû re kelijand. Ev xususiyetên hanê rojnameya Welat di dîroka çapemeniya Kurdî de ji rojnameyên din veqetand û rêza yekemîn da wê. Dijmin weke her caran di sa zêde sebir nekir, rabû Welat da dadgehê û girt.

Lê li gor vê rola dîrokî, xwedîderketina li rojnameya Welat ne ew qas bi hêz bû. Belê dema pêşniyariyan nîn e. Dema xebatê ye. Dema çekirin û avakirinê ye. Di sa bi çekirin û avakirinê re pêşniyarî û rexne dikare cihê xwe bigire.

Berpirsiyarên ku hîn bi hêztir xwedî li Welat derketana diviyabû ku nivîskar bûna, em rewsenbîr bûna. Me xwe baş neêşand. Di destpêkê de gelek nivîskaran bi Kurdî dinivîsand. Vê em

şad dikirin. Kengê Welat li astenga qelîbî, belavkirina wê kêr bû, nivîskarên me ji hêdî hêdî dest bi nivîsandina Tirkî kirin. Li dijî vî nîn im ez. Lê çima, ji bo nivîsên Kurdî, ji bo berdewamkirina weşanên Welat me xwe neêşand. Xwendevanan wê rastiye dît, ew jî, ji kirin û belavkirina Welat sar bûn. Di hejmarên xwe yê dawî de Welat ketibû warekî wisa ku mirov digot qey di nav çapemeniya Kurdî de ewladekî sêwî ye.

Rast e, Welat demekê neweşiya. Lê em hemî

Pîroz bêt Welatê Me

Em derya gewreyey ke tê ronîn û hekekû giryani

bawer in pêvajoya wê tu car ranewestiya. Lewra hezkirin û evîna me ya ji xwendin û nivîsandina Kurdî re di dilê me de her tim jiya. Şerê azadiyê rê heta dawiyê vekir. Bi hezaran çavkanî û berhem hene. Îmkan hene. Bi van hêzan hîn gelek Welat dikarin derkevin. Tenê ku em bikarbin van berhem û îmkanan bi kar binin.

Belê Welat ranewestiya. Îcar bû Welatê Me hemiyar. Welatê Me hîn bi hêztir, hîn geştir dest bi weşanê dike. Tu bi xêr hatî Welatê Me! Dij-

komelêk xelkî têda reng edatewe. Debête mûmekî niwey zemen û durustbûnî gewretirin ferhengî kurdî û mîjû netewayetîman. Em derwazey durustbûnî welatî ême ye û hengawaniyê bo rengdanewey wûşey pak û durustkirdinî gewretirin xor. Ke ewaney guwe le rastîn nagrin, ber guweyan bikewit. Ewaney

min û hempayên wî bila baş bizanin serkeftina Kurdistanê, serkeftina zimanê Kurdî ye, serkeftin û bi hêzbûna weşanên bi Kurdî ye. Welatê Me bi derketina xwe di nav weşanên Kurdî de nişana serfiraziyê ye. Hêviya me gelek xurt e. Divê kêmasiyên rojnameya Welat ji me hemiyar re bibin tecrûbeyeke mezin ku em bikaribin Welatê Me bi serfirazî bidomînin, ji berê hîn bi hêztir bikin.

N. Dirêj

kwêr in. Tişkî tazetirin roznama çawyan bikatewe. Ke bo şavey gewrekanî em tarîkî zeman ronak bikatewe, be rastiyekean pîroz le Welatê Me ke hewl be xorêk edin, ke li wilatî ême helbêt. Pîroz bêt Welatê Me, pîroz wûşey Kurdî min!

Mihemed Bahadîn

Tu bi xêr hatî nava me

Ey Welatê Me tu bi xêr hatî nava me. Te xêr, xweşî, şahî û dilan anî nava gelê me. Ey Welatê Me, heta baweriya te hebe ji gelê te, sonda me heye bi navê te, winda nabe navê te. Tu car namirin şehidên te.

Ey şehid Şêx Mihe-med Emîn, heta em hebin li darê dinê, tê tim di bir û baweriya me de bi.

Gelî nivîskar û xebatkarên Welatê Me em hurmeta xwe pêşkêşî we dikin, di têkoşina we de serkeftinê dixwazin.

Fewzilemîn Xashesanî Çorlu-Tekirdağ

Bi derengî be jî, me xwe gihand hev. Di destpêka her weşanê de çend peyv li ser sebebê derketinê tên gotin. Weke ku Apê Musa di hejmaraya yekemîn a Rojnameya Welat de digot, "Emê çima dernekevin?" bersiva me ye jî. Ev bersiv zarûriyeta vî karî nîşan dide. Di vê dema ragihandinê de ku bêhejmar weşan bi zimanên din derdikevin, nebûna weşanên kurdî ji bo Kurdan kerûlalî ye. Di dawiya sedsala bîstan de nezanîna xwendin û nivîsandinê ne kerûlalî be çî ye ji bo neteweyekê? Gelekî ku nebihîse û nepeyive wê bi çî awayî karibe li mafê xwe bigere?

Ya rast ew e ku em li sebebê derengmayîna xwe bipirsîn. Ya baş ew e em demek ji ya din zûtir kêmasiyên xwe yên di vî warî de ji holê rakin, da ku xwe ji vê kerûlalîyê xelas bikin. Wek Rojnameya Welatê Me, lazim bû em beriya çar mehan derketana, bes carina hin tişt li gorî daxwaza mirov nameşin, rê dîr û dirêj dibe. Li aliyekî qedexa û zicîrên dewletê, li aliyekî bêîmkaniyên aborî, li aliyekî din jî bêleqebûn û xemsariya rewşenbîrên Kurd ya li hemberî zimanê kurdî li



JI WELATÊ ME

Mazhar GÜNBAT

Welatê Me rûmeta me ye

ber çavan e. Tevî vê yekê hêviya me pir e; şert çiqas dijwar dibin bila bibin, di vî warî de serkeftina me zarûri ye. Her hefte birêkûpêk emê şazdeh rûpelên xwerû bi Kurdî, li ser mijarên cur bi cur pêşkêşî we bikin. Armanca me ew e ku em bibin deng û zimanê gelê Kurd. Emê vî zimanê ku heftê sal e hatiye zicîrkirin û hê jî zicîrên xwe bi taybetî jî li Kurdistana Bakur neqetandiye, di her warê nivîsandinê de bi kar bînin, bi pêş ve bibin. Helbet bicihkirina zimanê rojnamegeriya Kurdî karê me yê bingehîn e. Her xwendevanekî Welatê Me gerek e xwe bi qasî me mesûl bibîne di pêkanîna vî karî de. Wek hemû rojnameyên

xwedî şexsiyet, Welatê Me jî xwedî xêzeke siyasî ye. Welatê Me her tim wê li tenişt têkoşîna rizgariya gelê Kurd, azadiya hemû gelên bindest û nixên mirovahiyê be. Di rûpelên Welatê Me de niha bi sê zaravayên Kurdî (Kurmançî, Dimilî, Soranî) wê nivîs bîna weşandin. Ji bo me her sê zarava jî girîng û bingeh in. Li gor malzemeyên di destê me de nivîsên bi zaravayekî ji yên din wê hindiktir an jî pirtir bin. Halêhazir nivîsên di destê me de bi giranî bi Kurmançî ne. Zimanê me heta ji destê me bê wê hêsan be. Her çendî em dixwazin zimanê xwe ji bin tesîra zimanên din xelas bikin û mumkûn mertebe Kurdiyeke saf bidin bicihkirin

jî, di destpêkê de ji bo ku xwendevanên me bikaribin ji me fêhm bikin, em zêde zorê nadin zimên. Ji ber vê yekê heta demekê, ger di nivîsan de em peyvên bi Tirkî, Erebî û Farisî yên ku di nav gel de tînin zanîn bi kar bînin, ewê ji bo baştir danfêmkirinê be. Feqet zimanê ku em di rojnameyê de bi kar bînin çiqas rehet be û di nav gel de bête zanîn jî, wê li gor rêzik û qeydeyên gramera Kurdî be. Di gramer û îmlayê de emê Mîr Celadet Bedirxan esas bigirin. Îro Kurdên ku bi Kurmançî dinivîsin bi giştî gramera Celadet wekî esas qebûl dikin. Lê di îmlayê de hin kes ji Celadet vediqetin. Lê dîsa jî îmlaya Mîr Celadet ji yên din zehftir tê bikaranîn. Em hem di gramer hem jî di îmlayê de wî zimanzanê Kurd ê herî pispor dizanin û qebûl dikin, ji ber wê yekê jî emê di her du mijaran de jî riya wî bişopînin. Ji bo ku rojname baştir, bedewtir û xurtir derkeve em li benda nivîs, çîrok, serpehatî, pêşniyar û rexneyên we ne. Gerek e hemû Kurdên welatparêz li Rojnameya Welatê Me xwedî derkevin. Welatê Me rûmeta me ye.

WELATÊ ME

Li ser navê
ROZA Basın ve Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
Aynur BOZKURT

Gerinendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
Mazhar GÜNBAT

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran
(Yazışleri Müdürü)
Mehmet GEMSİZ

Berpirsiyarê Nûçeyan
(Haber Sorumlusu)
Suut KILIÇ

Redaktor
Sami TAN

Berpirsiyarê Têkiliyên Gelêrî
(Halkla İlişkiler Müdürü)
Sıraç AKSOY

NAVNİŞAN (Adres)
Ayhan Işık Sok. No:23/3
BeYOĞLU / İSTANBUL

TEL-FAX
249 13 44 – 245 29 91

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

NÜNERİ
(Temsilcilikler)

Hewlêr- Niwa Hebib

Suriye- Jan Dost
Fener Rojbiyanî

Berlin- Abdallah Osman
49-30-337 87 85

Hamburg- A.Hekim Gülsün
49-40-40 33 88

Bonn- Ahmet Baraçkılıç
49-228-66 62 49

Amsterdam- Cotyar Zaxoy
31-20-613 07 66

Swed- Amed Tigris
46-8-740 69 81

Hannover- Selîm Biçûk
49-5721-813 60

Munchen- Mahmut Gergerli
49-871-670 884

Atina- Sirwan Reşid
Bekir Bahoz
30-1-3634905

WELATÊ ME

rûmeta me ye

Em we dawetî şeva xwarina danasînê ya
Rojnameya Welatê Me dikin.

Bi beşdariya we emê kêfxweş bibin.

Rojnameya Welatê Me

Roj: 21 Sermawez (Kasım)
Saet: 19.30 – 24.00
Cih: Karides Restaurant **Tel:** 517 16 17 – 517 16 18
Navnîşan: Kennedy Caddesi No. 90 Sahilyolu Yenikapı/İST.

Navnîşana Rojnameya Welatê Me

Ayhan Işık Sok. No: 23/3 BeYOĞLU/İSTANBUL **Tel-Fax:** 249 13 44 – 245 29 91

MA SEREKÊ XWI SEYÎD RIZAY XWI VÎRÎ NÊKENÎ

Seyîd Rizawo Dêrsimîj, eşîra Şêx Hesenan ra, lacê Seyîd İbrahîmî ê tewr şenik o. Yê ra vêşîr hirê biray yê yê bîni zî bî. Seyîd Riza, şarê Dêrsimî miyan di bi nameyanê "Rizo" û "Lacê Baboy" zî yeno şinasnawîş. Lacê Baboy serêkê cengê Dêrsimî yo û welatperwerêko vengandaye wo. Awka yê û dewleta Tirkan hetanî mergdê yê, çî ray yew vay ra nêşîya. Yê caran bi dewleti bawer nêkerdo û nêwaştê dewleti têkilê Dêrsimî biba. Yo semedê azadiya Kurd û Kurdîstanî hetanî ki weş biyo, guriyawo.

Ma nêzani çend gedey Seyîd Rizay bî. Ma nêzani ew ro keydê yê ra yew mendo yan nê. Labelê hewawo ki Nuri Dêrsimî nuseno, nê cengê gird di gelek kesî keydê Rizoy ra şehîd biyî. Lacê yê yo gird Şêx Hesên, hirê tornê yê û cenîya yê Besê, "Lejê Kozluca" di ebi

hinzar çekdaran reyra amey kiştîş. Lacê yê yo şenik Huseyn Resik, cengêk di bomdba da teyara reyra birîndar biyo û kewto destê Tirkan. Tirkan tira pey vo zî, Seyîd Rizay reyra xeneqna-wo. Lacê yê wo bîni ki namey yê Bava İvrayîm (Bira İvrayîm) o,

dewa Sîne di bi destê eşîra Qirxan yeno kiştîş. Bêguman kiştîşê Bava İbrahîm di rolê dewleta Tirkan vêşî yo. Hewawo ki Münzûr Çem nuseno, mabênê Qirxan û Bava İvrayîmî weş nêbiyo. Qirxan ra yew veri bi destê Bava İvrayîmî birîndar biyo labelê tira pey herdi eşîrî pê ameyî. Dewleta Tirkan na mesela zana. Eşîra Qirxan fit kena ki Bava İbrahîm bikîşî. Bava İvrayîm gama ki Xozat ra ageyreno yeno dewa Sîne, weyra kişiyêno. Seyîd Riza norûdora dewi gêno û kiştixanê Bava İvrayîmî wazeno. Dewleti hem nêdana hem zî hêrişê Seyîd Rizay kena. Ebi abi hewa beynarê herdi eşîranê girdan ê Dêrsimî di lej dest pê keno. Eşîra Qirxan zî desta dewleti gêna. Cengê Dêrsimî hîni çend şono endî gird û vila beno.

Bava İvrayîm yew canmêrdo

zanaye û namedar biyo. Şarê Dêrsimî deyîrî eşî yê ser. Nê deyîran ra yew, ana dest pê kena: "Vajî vajî vajî/ Pîr Bavayê xo ser vajî!/ Pîr Bavayê mi/ Tekito şîvo Xozato vêsaye/ Cêno Begligêna Kirmanci/ Cêra tekito amo Şîna vêsaiyîye/ Heq.../ Sêy Riza vano:/ -Bava!/ Mordem nêsono çê dismen de mêmman nêbeno/ Mordem nêvirazeno nêzereno/ Dirvêta dismen ser/ Ú xo dest ra biko melhem nêkeno./ (Münzûr Çem, Tayê Klamê Dêrsimî, Stockholm 1993)


Lejê dewleti û Seyîd Rizay hetanî payizî rameno. Dewleti hewnîna nişna Dêrsimjan, dest bi dek û dilavar kena. Wesênena Seyîd Rizay ser o ki bêro Erzîngan û ûja di yeno tepîştîş. Bi tepîştîyavîşê Seyîd Rizay, cengê Kurdan verra verra sist beno.

Gelo Seyîd Riza key amewo Erzîngan?

Na mesela ser o hergû yew yew çî vano: Nuri Dêrsimî nuseno ki Seyîd Riza 5'ê aşma payizî ya verîni (05.09.1937) di amewo Erzîngan. Kovara Berhemi kitabdê "Türkiye Cumhuriyetinde Ayaklanmalar, 1924-1938"

neqil kena ki no tarîx 10'ê aşma payizî ya verîni (10.09.1937) yo. İsmail Beşikçi kitabê "Tunceli Kanunu (1935) ve Dersim Jenosidi" di nuseno ki Seyîd Riza 5'ê aşma payizî a verîni di tepîştîyawo. Wendoxî wa bizanî ki haya Beşikçi, kitabdê "Türkiye Cumhuriyetinde Ayaklanmalar, 1924-1938" ra esta. Yo bi xwi nê kitabê ra gelek nuştan neqil keno. Pars Tuğlacı kitabê "Çağdaş Türkiye Tarihi" di nuseno ki Seyîd Riza, 12'ê aşma payizî a verîni di (12.09.1937) tepîştîyawo.

Hewna nuştoxê Berhemi neqil keno ki kovara "Medya Güneşi" di nusiyawo, Seyîd Riza, 5'ê aşma payizî ya verîni di tepîştîyawo. Seki yeno zanayîş İhsan Sabri Çağlayangilî xatirayandê xwi di behsê na mesela kerdo. Labelê tarîxê tepîştîşê Seyîd Rizay ser o çî nêvato.



Hewawo ki Beşikçi nuseno gama ki Seyîd Riza tepîştîyawo, rojnamanê Tirkan gelek na mesela ser o nuştê. Eke kes bişo rojnamanê ay wextî peyda biko ko na mesela hina asan biba.

Rojê xeneqnayîşê Seyîd Rizay zelal niyo. Beşikçi û Dêrsimî nuseni ki Seyîd Riza, 18'ê aşma payizî ya peyeni di Xarpêt di amewo xeneqnayîş. Nuştoxê Berhemi, nê tarîxê rê zî îtiraz keno û vano no tarîx, 15'ê aşma payizî ya peyeni yo. Gore bê Pars Tuğlacı zî, Seyîd Riza 15'ê aşma payizî ya peyeni 1927 di amewo xeneqnayîş. Eşkera wo ki 1927 yew şaşeya çapî ya. Yewna şaşeya Tuğlacı esta. Yo vano ki Seyîd Riza berdo Dêrsim û ûja dardi kerdo. Çağlayangil bi xwi gava xeneqnayîşê Seyîd Rizay di yê hetî biyo. Yo vano ki Seyîd Riza,

Xarpêti di amewo xeneqnayîş. Bêguman mesela rojê xeneqnayîşê Seyîd Rizay zî ganî roşn biba.

Seyîd Riza, 75 serrî hezey canmêrdan ciwiya. Gama ki qewmîyay zî zana hezey canmêrdan bimro. İhsan Sabri Çağlayangil bêhemdê xwi bo zî, behsê na canmêrdeya yê keno: - Ma Seyîd Riza vet meydan. Sard o û norûdor di çewek çîno. Labelê seki meydan gillî ra mêrdimî bi; bêvengêy û vengêy rê xitab kerd, va: "Ma ewladê Kerbala yî. Bêxeta yî. Eyb o, zilm o, qitil o!" Muy mi, mi ro biy sey teluy. Nê merdimê kalî, lingê rep-rep day erd ro şî. Qereçî (qereçî çellad o. J.E.) nuski da. Kendir kerd qirika xwi. Linga xwi day kursî ro û abi hewa xwi xeneqna."

Qisanê yê yê peyenan ser o

Zinar Silopî û Nuri Dêrsimî sewbi çivan vanî. Gore bê Silopî û Dêrsimî; Seyîd Rizay gama ki yena xeneqnayîş ana vano:

- Ez 75 serre ya, şehîd bena, şona şehîdanê Kurdîstanî miyan. Zorê Dêrsimî şîyo la ko Kurd û Kurdîstan biciwiya. Ko ciwanê Kurdan heyfê ma bigirî. Wa bimrî zalimî! Wa bimrî bêşerefî û zuray!

Bêguman qiseyê anasarêni hesabdê İhsan Sabri Çağlayangilî nîni. Beno ki aw semed ra yê behsê nê qiseyan nêkerdo.

Dewleta Tirkan no di aşmî yo, dest pê kerdo rayna dewanê Dêrsimî veşnena, talan kena. Giregirane şovenan ê Tirkan vêşîr herkes zana ki Kurdî kiştîş û qirkerdişî reyra nêqediyênî. Ma hey weynî nê gonîwerî key na mesela fahm kenî!